Ji kûratiya xemên bê deng * Şêrzad Zeynelabidîn

Ji kûratiya xemên bê deng * Şerzad Zeynelabidîn

© Şerzad Zeynelabidîn * Han-Grafik
Ji Weşanên Han Çapa 1.
Berlîn/Kanûn-2010
Weşanên Han – 55
Helbest– 23
Edîtor: Zeynel Abidîn Han
Berg Design: Gazîn Onur Han

Çap û Girêdan:
HAN-GRAFIK Verlag & Werbeagentur
Cranachstr. 62 12157 Berlîn
Tel.: 00 49 (0) 30 47987052
Fax: 00 49 (0) 30 47987054
www.evra-kitap.com
han-grafik@hotmail.de

ISBN: 978-94040997-16-6

Şêrzad Zeynelabidîn

***Ji kûratiya xemên bê deng***

HAN Helbest

Ji berhemên hatîne çap kirin:

*Welatê Tirs û Tehliya,* 2003 helbest bi tîpên erebî 104 laper

Ji berhemên nehatîne çapkirin.

1- Ferhengokek bi zimanê Firensî Kurdî, Helbest li se şewe yê nûbihara Ehmedê Xanî
2- Dîwanek bi zimanê erebî
3- Gelek helbestên din li ser babetên cûda cûda wek nekamî, rexne, htd…
4- Bîrhatinên min, kurte jiyana min li gel bîrhatinên 1974 - 1975 ê her weha Enfala Tebaxa 1988ê, ez bi xwe di nav de bûm li gel zarok û mala me.

***Jiyannîgarî***

Li 19 Gulana-1954 li gundê Çemseyda hatîme dinyayê.
Li Adara 1974 ku qutabî yê şeş ê amadeyî bûm peywendî min bi hêzên pêşmergey kir. Payîza 1974ê çûme Mahabad, paş dîtina halê gelê me li Kurdistana rojhelat û bo min diyar bû ku Îran dê

pişta xwe det me tivenga pêşmergaytiyê min dana û çûme gundê Çemseyda û ders min gotine qutabiyan hêviya paşeroja me.
Derçûyê amojga amadekirina mamostayan Hewlêr 1978. 1988 ku ez li devera rizgarkirî ya Berwarî Bala bûm ji ber Enfala derbazî Kurdistana bakûr bûm paşî li Kampa Mêrdînê li ser ciyê bab û kala bûyîne penaber!!
1989 xanima serokê Firensa dihête seredana me nameyek min bo nivêsî û paşî em wergirtîn wek penaber û heta nihe em li Firensa ne. Dîploma (éléctricité d'équipement industriel-niveau V) ji AFPA min wergirt.
Ji meha Îlona 1991 heta niha ez kar dikem wek (Opérateur Laboratoire) kargeha ISOROY.

**Zivistan**

Befrek dihêt hîr û nerim
Girtin ban û deşt û zevî
Hat zivistan birha gerim
Kewa barkir (Hudhud) revî

Ne (mêşxurînk) evro hene
Ne (kûk) li daristana dikenît
Ne (hecîreşk ) li mala mene
Da ber kaşxankêt me bihunît

Hevrist spî bûn wekî bûka
kirasê nû yêl berkirî
Çiya pîr bûn hosa zûka
Wextê ku berfê lê kirî

Pirçê biya li ser rûbarî
lûlaqe vêda hat ne xar
Dê bêy ku şekra lê kirî
F' avê dikevin ew car û bar

Evro çûçik di şepirzene
Çi tişt nîne ku ew bixon
(Tehle) û (garis) jî di berzene
Lewma bir, bir hêrve diçûn

Pîrejina jî pit pite
Dibêjin dayê vê zeyqetê
Pîrê kal jî herê mite
Derê sopê bi gazka ketê
Bi tinê zarok di girnijin
Çaxê befir di barîtin
Li ser mila di hel peqijin
Gava dewsa kewa dîtin

Hemî pêkve çûn karkewê
Hem rava kêvrîşk û gura
Her êvarî di kevne xewê
Li gundî vemirhan tev çira.

*mêşxurînk=balindeke zirkêtk û mêşen hingivî dixwin. Hecîreşk =balindeke biharê dihêt hêlînkên xwe li berkaşxank û banên şikefta çê diken bi erebî(sinono).*

*15/02/2005*

**Bilindken Ala**

Bilindken ala Kurdîn Newroz e
Cejna gelê me gelek pîroz e

Roja nemana Dehakê xwînmêj
Hat li gel biharê xemil bûne hêj

Her çend ku Newroz vegerhît salan
Agirî helken bixemlînin malan

Dibîte şahî û cejna biharê
Evîn dibarît ji çavên yarê

Befir dibît belek li serê Metînî
Reşwêle bang den bi şewq û evînî

Befir dihelhît nêrgiz bi naz in
Ku herdem xûkê ji lawa dixazin

Rojên sitemê êdî nebînin
Dara azadiyê herdem biçînin

Meşxel bilind bû li Kerkuka Başûr
Mizgîn bigehte Ameda Bakûr

Ronahî bide te Kuban û Efrîn
Bixemlît Sîpan û Wana dêrîn

Germek bigehte momên çar çira
Da pêk ve hel bin birevînin gura

Serdeşt û Bane dê bin mirarî [1]
Ew dê rizgar bin ji destê mirarî [2]

Wata Newrozê her serferazî
Her rizgarbûne ji destê berazî

Ger çî dirêj bû şeva me Kurda
Hero dibînîn sed heyf û derda

Eger diyar e û hemî dizanin
Çend bê tifaq in hem bê xudan in

Xudan me nebît me pakî nîne
Fermo da Xanî tu baş bixwîne

Ger em êk bigrîn dêhêtin bihar
Dê zêtin kanî bişkivît çinar.

[1] mirarî: = mirwarî, morîkên bi nirx.
[2] mirarî: = tiştê pîs, bêhna pîs lê bihêt, anjî ajelê bimrît bêy bihête serjêkirin.

*15/03/2005*

**Derbederî**

Derbeder yê kes nebînît wey li min baba jehre mare!
Evî tovî kesê biçînît çak bizanin ejdehar e

Leşê li vêrê û dilê li wêrê wekî xewna têt bîra min
Çend dawetên berî bêrê çawa geş dikir jiyara min

Bêhin û boya çiyayê min yê nedît bîtin li biharê
Qed nizanît ya dilê min çi hirmên têtin ji Derarê!

Ava Hirçûînkî bi Xodê kem ger tu bi gerhî li tev cîhanê
Nîne wek wê ku nêzîk hem şirînahiya  Kurdistanê

Çend sivik xoş û şirîne her kesê carek vexotin
Şekr û şîr û hingivîne ji evî kevrî tête dotin!

Şeng û şoxa li aqarê min kiras zera romet hinar
Ew sivik diket ho barê min ew ne bîtin nahêt bihar!

Ne kiçên Parîs û Lîmoj ne, ne Volvîk û Mon Bilan
Ji bîra min naben we êk roj li vî dilî qet nabin xudan .

*04/07/1991*

**Dîsa Bihar e**

Dîsa Newroz û bihar e
Dîsa Dehak li me kom bûne
Nê adar e
Kanê xudan?
Kanê şivan?
Kanê Kawe?
Gaziya wan ne diyar e
Guh bi denê
Li Qamîşlokê nê hewar e
Dijmin Be‘se seyê har e
Ger êk negrîn
Sed Helebçe dêhêneve
Ma ne bes e me ev kare?
Çima, ma em dibê spêdey ne
Li jiyara me her êvar e?
Dîsa Newroz û bihar e
Dîsa Dehak li me kom bûne
Nê adar e
Heta kengî bimînîn kole

An derbeder û aware?
Kes nebêjît eve xewn e
An xeyal e
Kes nebêjît dijmin bi hêze
Serxwebûna Kurdistanê
Gelek dûr û hem mehal e
Tiştê ji me kêm
Êk girtine
Ma ne bes e me ev hal e?
Werin sinora bipeqînîn
Rista zordariyê bibizdînîn
Ser û çavên pîs û çepel
Perdê ji ser rakeyin
Bi dirînîn
Werin pêkve yan em bimrîn
An maç bikeyn çavê rojê
Ronahiyê bi zorê bînîn
Li her çar parça
Ala rengîn
Da em hildeyn
Bi xwîna dila
Da bixemlînin.

*15/03/2004*

**Evro me seh kir**

Evro me seh kir rojê
Rojeke sar û bar e
Evro talane li hozê
Ji welatî bûyin awar e

Belav bûn li tev cîhanê
Bê semyan û derbeder
Ji Emrîka ta Îranê
Her Kurde may bê dever

Cara sedê dê bêjim
Her dê bêjim û bêjime ve!!
Hişyar im ez ne gêj im
Dermanê me bes ev e...

Bes êk bigrin bibin êk
Pênevêtin şer û ceng
Her ev bitenê maye rêk
Werin da bibîne êk deng

Werin pêjan keyn rezî
Gurgê borê dev beş e
Dê xotin trî û pezî
Bê mirwetey zikreş e.

*24/03/1994*

**Ez digerhim**

Li bajêrekê bê deng digerhim
Li Gizîltekê
Berî min kes neçû bîtê
Li periyeka rûs û pêxas
Bi tenê bi tenê
Ku mij di ber bît
Wez digerhim
Li peyveka nehêt kuştin
Li hozaneka nehêt gotin
Li axînkeka serjêkirî
Li awateka nehêt mirin
An li gulekê
Li çelên bilind
Rengê şevê tev vexarbît

Li kaniyekê li warê kûvî
Ji bilî stêra çi kesê dî nedîtibît
An li hespekê li xav berday
Dema dibezît
Li nav taryê pêt û gurrî
Ji nala birevît
Digerhim ez
Li êvareka şevê çirt ket
Li payîzeka bê zivistan
Bîte bihar!!
Li nêrîneka dilî kerket
Li welatekî li stêreka dûr
Ya bê mirov
Da ez û tu
Bîne hizar
Digerhim ez
Li rûbarekê jêhel biçît
Li rojeka bê ronahî
Li volkanekê jor da bipeqît
Li xetîreka hêj hil nebûy
Ez li şkefteka bê bin digerhim
Li çîçelokên zîv û zêrî
Celcelotê hero dixwînim
Ser û bin dikem
Pişta kevrî baş dixurînim
Her dixurînim
Hêj dixurînim .

*Celcelot= îlme an xwendineke-paraneweyek kevin e. Dibêjin şikefta Babekra ku dikevîte tiyê rojhelatê geliyê Bazê beramber gundê min Çemseyda ku heta niha kes negehiştiye dûmahiya vê şkeftê, dibêjin ku heke Celcelotê bixwînin dê dergehê vê şikeftê vebît û li paşila wê de mirîşkek zêrî û li gel çîçelokên-têşkên- wê hene. Dibêjin ku heke ev gencîneye derket devera Berwariya dê hind dewlemend bin ta nalên hespên wan bibine zêr, eve katê em zarok me ji mezina guh lê bibû. /2006*

**Ez pisyarê**

Ez pisyarê ji xwe dikem, hindek cara bersiv nîne
Ma bo çî xelk xelkî dikujin, eve di reşin yên dî spîn e?

Gelên Ereb Tirk û Faris, hemî neviyên Ademî ne
Boy zordariyê li me diken, boy dîroka we ya bi xwîn e?

Tiştê me bivêt mafê me ye, warê me qed bo we nîne
Bo çî guh didene dijmina, şîretên wan kerb û kîn e

Ger we şer bivêt em hazir în, hûn dizanin ka em kî ne?
Em nifşê Kawê asinger, herdem li ber me hûn rûvî ne

Destî dirêj ken aştiyê, bo rastiyê şerim nîne
Ger çi evro di bê tifaq în, dîroka me tu baş bixwîne

Wextê Dehak li me peyda bin, tu hinêra Kawey bibîne
Eger hêş hûn bawer neken, dînatî ji vê wê ve nîne

Kurê "Ocê " li bin pên Kurda, dê bêjî Salwê dîne.*

* kurê Ocê=Seddam
Li gel rêzên min bo salwê dîn tenha bi sîmay ve wek yek bûn ne bi xasleta.

*11/02/2004*

**Gelê mino**

Gelê mino
Li rûbarê êş û azara
Hizar cara der baz di bî
Ma çend cara
Li gemiya nehez û neyara
Siyar dibî?
Ev car bes e
Biryara te divêt tu bî
Heta kengî
Dê her nivî?

Xewek sivik mîna mirnê
Heta kengî tu ne rabî
Na liv livî?
Heta kengî tu naşkênî
Evê ristê
Evê xewnê
Bo hêşta bi werîsê xelkê
Bi werîsê xav û kulkê *
Di çî kevrî ?
Te pê di bene asmanî
Hem ewr î
Lê zû dikevî
Car li ser piştê û
Car li ser dev î
Werin ev car da bivehînîn
Werîsekê Kurdîniyê
Yê biratî û êketiyê
Yê bawerî û hem rastiyê
Take rêke ku em bi gehîne hûviyê
Dem hatiye
Rista zordarî bipiçînîn
Dem hatiye
Mêrg û nizara bixemlînîn
Dem hatiye
Li gel agirê pîr e Newroza vê salê
Li Amed û Babe Gurgur
Ala Kurd û Kurdistanê
Em hildeyn û
Biçiklînîn.

** hiriya kulkê : hiryeka ne ya baş bûye gotinên mezina:*
*werîsê kulkê = ne yê mûkim û saxlem*

**Ger bidûmahya!**

Ger bi dûmahiya jîna min bît, bibît rizgar welatê min
Bila her ev şeve bimrim, vemirhîtin çirayê min

Hilon bixemlînin tabotê, çêken wê ji dar hinara min
Tê bialînin kesk û sor zer, belkî pê bihêt hedara min

Belê ditirsim nehêt ew roj, hizar sala paş mergê min
Lew me ji çava xwîna dizêtin, agir ber bûye cergê min

Lê bo rêkek hinde pîroz, divêt şengistek bo mala min
Pirr mûkim bît ji kevrên aza, bibît guldan bo gula min

Me divên pale û hostayên jîr, da binikrînin dîwarê min
Hem dilsoz û mêr û çeleng, da ava bîtin warê min

Paşî dê şêm ji dil helmêjim, bêhna memkên (Şilêra) min!!
Dê rewşen bin erd û asman, mizgîn dê gehte (Stêra) min

*Frensa 2006*

**Halê me Kurdan**

Werin guh biden halê me Kurda
Çima dimînin bê milk û mewda?

Bo çî bi tinê em hosa di jarîn?
Terra û berrayên her çar kenarîn

Ne tev di nezan û bê milk û halin
Lê di kes perist û bo para dikalin

Heyfe tu bi kujî biray bo para
An tu bi girnijî bo Kurd neyara

Ger çî em Kurd hêşta ho mayne
Li ber bayê xelkî em qirş û kayne

Nehezên yektir dujmin perêsîn
Hirya me xave xelet di rêsîn

Yê ku me bi vêtin her mafê meye
Ma ji bilî rastiyê ma çi heye?

Duhok û Amed, Efrîn û Sine
Bextê dujminî heftê û heft kune

Ku jêk vekirin çar xwîşk û bira
Yêl me diherêfin tev rêk û pira

Ma kes nemaye li evê cîhanê?
Piçek bi wîjdan neket ziyanê

Carek binêrît halê me Kurda
Herdem li me şeve tarî bi serda

Ji Helebçe rabûn hawar û fîxan
Amed di nalît ji tuxmê Xaqan

Serdeşt û Bane herêt ken gazî
Kurdîn hûn rabin herin li pey Qazî

Qamîşlo Efrîn mane birîndar
Ji dest nemerdî rûviyê xeddar

Qed çi bawerî mi bi Kurda nîne
Carek bi bin êk ne bên yê dîne

Piştî mi dîtîn Enfal û kuştin
Zarok û landik hatîne sohtin

Em jêk belav bûyn hatîn bişaftin
Ber sir û serma nahên nixaftin

Hind jî bi saxî birin bin axê
Hêşta Kurd piçek naden xo zaxê

Çima nabin êk bi ken xebatê?
Bo serxwebûnê rêka necatê.

*06/01/2005*

**Kê gotiye?**

*Li roja 26/11/1991 ez nexweş bûm çûme cem doktor û paşî bo wergirtina dermanan çûme dermanxanê min raçêta (rapora) dr. daf dermanxanê lê çavê min bi sindoqek(kartonek) biçuk keft ke danabû ser mazeya dermanxanê li ser nivîsîbû (bo zarokên bê NoËl) ango yên bê cejin bê pere da ku pera kom biken ;hizr û bîrên min çûne Kurdistanê ka çawa zarokên me her nizanin ka noêl an cejin çi ne; ev helbeste di serê minda di hat û min hinê zanî ku ezê vegeryam bo otomobîla xwe min pênus helgirt û min nivêsî ez vegeryam ve mal deyka Sîpanî gote min tu çû Dr.? Min got belê. Got te derman anî? Ez li dermanan digeriyam lê belê min derman nedîtin; ez vegeriyam wê dermanxanê dermanên min yê ser mazê amadekirîne lê haya min jê nebû; min derman ji bîr kirin lê ev helbeste min bi xwera anî bû.*

**Kê gotiye?**

Kê gotiye zarokên me
Di bê (Nôêl) in
Kê gotiye
Gerravokên ava genî
Na şilqînin û na şêlin

Kê gotiye Hitlerên( Bexda)*
Geşe roja me dê bi moxlê veşêrin
Çend dibê mejî û di bê eqlin
Çend sar û lewçe û di çivêlin
kê kotiye zarokên me bê (Noêl) in
Kê gotiye sîmerxên xewnên me pîr bûne
Ne di cehêlin ???
Kê gotiye rêka xebatê ew dê berden
An dê hêlin ???
Kê gotiye nerme dilop
neşên kevrên hişk û aza
Bi kelêşin an qewêrin
Kê gotiye rondikên wan
Nabin şehmar
Nabin dawet
Nabin hewar
Singê nehezê nehomar
Jêk dadrînin û bi kêl in
Kê gotiye
Zarokên me di bê (Noêl) in
Kê gotiye gulle topa
Naken guldan
Kirêtiya derê xanî
Pê bi veşêrin
Kê gotiye gulle topa
Naken cuhnî
Da reş kilî
Bo ser salê
Têda bi hêrin.

*26/11/1991 Frensa*

Diyariye bo zarokên Kurda li her çar parça ku ji cejn û sersala di bê behrin.
*:hitlerên bexda an enqerê an Tehranê an jî şamê hemî mîna hev cejn û sersala ji zarokên me di revînin.

**Kela zulmê**

Bi serk da hat kela zulmê
peyker hemî di herftîne
Temaşaken evê bezmê
ku em tevda di keyfîne

Şahî yo kêf û seyran in
Bê tirs di nivin êvariya
Bilbil şeydayê gulan in
Pirr bi coşin li mêrg û bî ya

Evro şikest difna zordarî
Nifrîn li wan seddamî ya
Ku şîrê makerê xarî
Bin gorr bi ken Efleqiya

Hemî rojên me tazî bûn
Mirin hat bû derê xanî
Herdem axînk û gazî bûn
Hewar çû bûne asmanî

Jehr dibarî li buhara me
Gul di çirmisîn sihariya
Tev reş bi bû jiyara me
Bi bû tazî li van tevriya

Millet kir bû gola xwînê
Maf û wîjdan jî li bin piya
Kî dê saxket vê birînê
Veket tola tev gundiya

Veket tola şar û şaxa
An kanîkên berze kirîn
An jî tola dar û daxa
An zarokên Enfal kirîn

An jî tola van mişextên

Li tev cîhanê belav kirîn
An jî tola wan kotirên
Li ser hêlînê serjê kirîn

Belê çi bikem jiyar hoye
Bi bim gorî vî welatî
Dilê min şikest û pîr bûye
Bihara min direng hatî.

*Fransa 09/04/2003*

**Meger carek**

Meger carek di xewnê da, li ruxsarê te bim mêhvan
Bihêt bayê berê spêda, bi xêr hatî li ser çavan

Dizanim ez ji te dûr im, te nabînim evê carê
Xendiqiyê behreka kûr im, girêdayê zulfa yarê

Girêdayê zulf û xalan, berdam çola har û dîn im
Li hozana kirye talan, navê wê jî neşem bînim

Belkî carek rehmê bi key, bîmarê xwe bikey derman
Vê pencerê bo min vekey, li dilê sêwî bi bî semyan

Lê dizanim her wekî min, bi şevê heyve li te mêhvan
Silavek ji te geheşte min, lew bişkurîn erd û asman

Bihar xunav û gul tu yî, payîz û befr û dirk ez im
Şemal û mûm û roj tu yî, tarî û dûman û şev ez im

Tûy şilêra li nav tevriya, ez kewê bê sebr û hedar
Tû yî rewşa tev bêriya, wez şivanê dil birîndar

Dibêjin ev sal bihar nahêt, kew naxwînin li dergeliya
Xema dilî qed danahêt, terg dê barît li dol û çiya

Bo şeva min tu yî çira, taristanê pê di şeqînim
Ger tu ne bay da bêm çira, ez dijîm û an dê mînim.

*25/12/2004*

**Min dîtin**

Min dîtin rondkên baranê
Min dîtin sal hemî payîz
Min dît bê dadiya jiyanê
Min dît rastî ma bê biha
Min dît bihar koç ber dibin
Kanî hemî di hişk û zuha
min dît gurgê bûye şivan
Ker jî çûye ber garanê !!
Min dît mirôvê çar sîber
Keçî yêk roja li cîhanê
Min dît rûbar jêhel diçin
Û şev bi rojê diket dîlanê
Min dît dayik bi tazî û behî
Min dît xwîn jî bûye lehî
Min dît sir û serma û baran
Min dît xoşî û keyf û seyran
Lê min nedît ku carekê
Yara ciwan
Li xerîbiyê
Li xewnên min bi bît semyan
Bi bît mêhvan.

**Serxwebûn**

Dê nivêsim
Ser ewr û ba û bahozê
Ser befr û bagêr û tozê
Dê nivêsim
Li ser qurmê kevne darê
Ser singê te
li navbera herdu memkên dostê yarê
Dê nivêsim
Ser baqofkên vê biharê
Ser lêvên te
Ewên terr bûyin ji xunav û hem xwîsarê
Ser pirça te
Ewa herdem wek sûlava tête xarê !!
Dê nivêsim can navê te
Li ser derazînka xanî
Li ser kevrên hişk û aza
Li ser herdu perrên sîmerxa
ser asmanî !!
Ez dildarê navê teme
Ey serxwebûn
Dê nivêsim
Li ser êş û tev azara
Dê nivêsim
Ser axînkên evîndara
Li ser xewnên berê spêdê
Li ser hetav sorkên êvara
Dê nivêsim rind navê te
Li kefa gopalê şivanî
Li ser gola rind bêriya
Dema pez êvarî dihête
Hefşû û danî
Li ser berên ûsla tirî
Wî mermerî wî helanî
Dê nivêsim
Ser balîfka zavaynîyê
Ser gustîlka kabaniyê
Ser çinara sîberê dide te kaniyê
Dêkolim wî şeng navê te
Ser xep û nîrkên hevcarî
Ser gêsinî
Ser herdu zendkên cotyarî
Dê nivêsim
Li ser pêkuçkên kevne warî
Li ser xîveta derbederyê
Li ser dilê xwe
Min ew maye

Ha bo te ew jî diyarî .

**Seyrana Geliyê Bazê**

Nalênek tête guhê min
Ji qehr û kovanên berê
Vê nalênê sot dilê min
Ji ah û oxên dilberê

Roja wem çûyne Metînî
Şkefta Babekra şirîn
Di dilê minda xwe di hewînî
Lew li me kûr dibîtin birîn

Ew çi deng bûn ? ew çi reng bûn ?
Ew çi bêhn û çi keval ?
Kanî ji bin kevya nê der bûn
Her kesê girtî heval

Qebqeba kewê rubade !!
Ba di hejînît tevriya
Wek dar alînka xwe bade !!
Bibe rewşa van çiya

"Kanî şîlanka" bi naze
Qurpe qurpa qumriye
Li "Ber Berayê" to biraze
Ne spêdê êvariya (1)

" Kon Befrê " here bibîne
Warê qaqîşk û qela

Nê li havînê çenda hîne
Babelîsk jî li ber çela

"Nihala darbestê " rêke
Da ji gelî derbaz bibî
Çeperî ji tevriya çêke (2)
Ger te bivêt girêl nebî

Serketîn serê Metînî
Deşteka pan û berîn !!
Di nav gul hirça da em rûnîn
Çawa dernabît evîn ??

Gul şilêrek bi şerm û damay
Min dîte li ber tevriyê
Min pirsyar kir tu bi tinê may?
Girî kefte gewriyê

Ey heval ma tu jî dibînî
Wekî min van tev xema
Ma tu jî yê dil birînî ?
Jiyê me çi jê nema
Rondik pêgve me barandin !!
Ji ber sûr bû ava çema !!
Destên xwe min li dor alandin
Li "Çemêseyda" bo sema !!

*Bîrhatina seyrana 1972*

*(1) spêdê hetav li berberayê di det, piştî nîvro sîbere .*
*(2) li nihala darbestê çeperek kir bû pir ,tenya*
*rêk bû di sera derbaz di bûn ,navê nihala darbestê*
*jî ji hindê hatye .*

**Yara min**

Yara min çav reş xumare
Kirme dêwane li şevê
Ew çi naze jê di bare
Dil ji min çû ket revê

Dil ji min çû bervî çola
Çav kalê kirme hejar

Ketme bîş û dirk û dola
Wey hewar û sed hewar

Min nezanî çi evîn bû
An jî xewne an xeyal
Êk girtin bû an revîn bû
Bo çî ne bûyne heval ?

Çavên birsî pirr birûsî
Hilkişyam nav derya kûr
Bo çî ji çavên min ditirsî
Pêgve dê çîn li rêka dûr

Sûnd dixom bi roja biharê
Katê rûniştîne xar
Taqe maçî demî yarê
Ta ebed mam şêt û har

Ta ebed ew yad emênê
Ta ku mabim min le jîna
Hest û hoşim ebziwênê
Wek dildarî Mem û Zîna.

*25/11/2004*

**Heyva Kew çerînê**

Helat heyva kew çerînê
Were da biçîne evrazî
Biçîn warê Mem û Zînê
Li bin tevriya û siha mazî

Were da biçîne zozana
Li ber çel û kevyên belek
Bi çîn wargehê hozana
Li ser her gulê hizar melek

Bêrî di hên dem bi awaz
Serê rûya girtîn xunav
Lew şivanê dil belengaz
Sohtin li wî cerg û hinav

Dengê kewa carna dihêt
Carna Şalîl û Berkute *
Kanya hozana lew dizêt
Lewma çiya carna mi te !! *

Bêdengiyê girtin nihal
Bêhna helz û esmîna

Ji bin kevya tê ava zelal
Av det binefş û beybûna

Heyva kew çerînê bêtin
Ma bo çi ye bêy Kurdistan
Tarî dê li vî dilî zêtin
Li gel min nîne yara ciwan.

**Berkute û Şalîl balindên here deng xweşen Kurdistanê ne.*
**mite=bêdenge.*

**Berî spêdê**

Ger te bivêt
Berî spêdê
Min bi bînî !!
Pirçê xwe tu berelake û
Stiraneka bêdeng bêje !!
Dê min bînî ...
Li gel şine bayê siharê
Dê min bînî ...
Li gel hejîna belgên darê
Dê min bînî ...
Li gel permîçkên
Nerme befrê
Li heyva şiwat û adarê
Dê min bînî li gel xewnên
Kew û şalîla !!
Li gel hejîna babelîskên
Vê zinarê
Berî spêdê
Ger te bivêt min bibînî
Li jêheliyê şeva tarî
Vêt serkevî
Ger te bivêt berî spêdê
Guh bidey kevrê bêdeng !!
Sîmfoniyek nû dê bînî
Berî spêdê
Ger te bivêt
Li bin tevriyê
Paldey rûnî
Hozaneka
Bê peyv û kêş û ne serwa !!
Wekî tevnî
Dê raçînî

Spêdeka zû
Pêş (sew gurgê)
Li (Berberayê) *
Ez raza bûm
Min guh dida
Sare stirana vî kevrî !!!
şalîl ji nûka ji xew radibûn
Heyv berze di bû li pişt ewrî
Berî spêdê
Her titşek nê rûs û sare !!
Berî spêdê
Xunav di barît û stêr hemî di bin aware
Hemî şeva berî spêdê
Dergeh li taqe û
Li hûviya teme
çavên min wek kulyên birsî !!
Hemî stêra pê diçerînim
Lê nehatî û
An nizanî ku ez heme
An qirqiçîna min li şevê
Bo te ne pşitî û ne xeme
Berî spêdê
Bê dengiye
Davên taryê
Wek nermatiya
Armîşiye !!
Wek pirça te
Li gel dengê bayî
Bo min dawet û gaziye
Berî spêdê
Dibêjin dê hêyî
Ji stêreka dûr...
Li çolê dilê min dê dadey
Evî xirtey
Dê key beheşt
Dê keye zûr.

*05/08/2004 Frensa*

**Kurdîn hevalno rabin**

Kurdîn hevalno rabin
Roja me çû avayê
Bes ji yêk tera û bera bin
Yê di sojît cergê dayê
Dayka me nê ew xake
Cihê bav û bapîra
Ka heyfa wê tu rake
Herşev helken xetîra
Wekî di hêtin Newroz
Qed tu Kawey ji bîr neke
Ew rêke bû me pîroz
Xwîn mêja tu adeke
Ne bê dijmin bi hêze
Baş dîrokê bixwîne
Kengî dujminê birêze?
Başê wan jî çi nîne
Ka Hîtler û Holako ?
Kanê ye Mosolînî ?
An jî kanê Firanko ?
Seddamî jî tu dibînî
Hemî ketin jêr piya
Nifrîn li wan dibarin
Her berze serê çiya
Roj tev cejn û bihar in.

*2005*

**Şevên sar**

Şeveka sar
Gava axînk ji tirsa dimirin
Pêlên germê
Di kûratiya çavên te da
Di bin ronahî
Dizên û difirin

Şeveka sar
Stêr li asmana
Wek zarokên rûs û birsî
Sewka heyvê yê vedirojin
Tê da dirûnin
Dikene kursî !!

Şeveka sar
Li ber ronahiya Babe Gur Gur
Zarokekê Kurdê çav geş
Ji serma da mir
Ji serma da mir

Şeveka sar
Ez û tu û heyv mişext dibûyn
Doşek erd û ber asman bû
Beref dumanê em diçûyn

Şeveka sar
Me gund hêla xir û xalî
Law û cehêl
Heta pîrê li ser gopalî
Şeveka sar
Li bin çadira derbederiyê
Dizek hat û hindî gerya
Min çi nebû
Xewna min bir
Xewna min bir.

*09-04-2004*

**Kurda rabe**

Kurda rabe nê êvar e, roja me çû pişt çiya
Ne me mal e û ne me war e, em ketîn dest rûviya

Carekê guh bide "Xanî", bi bine yekdest hûn hemî
Da avakeyn pêgve xanî, bûy ji dîrokê bêxemî ?

"Gerdî hebwa" hûn bi cîh bînin, dêrevînin tev xema
Çima kur in vê nabînin? Keyf û şadî me nema

Çil milyon îro dinalin, ji destên pîsên çepel
Ligel êk du dirk û dalin, an bizotin çeq û pel

Wey hewar e bo van Kurda, dilê min pêt û birîn
Kî derman ket kul û derda, bê nujdar ha dê mirîn

Bê nujdarîn lewma evro, mitayê me bê biha
Hem bê dask û merr û tevro, ji rêçalî dev zuha

Her kesê nê berê li xo ye, kes nabêjît ha bira
Lewma her me rev û roye, wem di kevîn bin çadira.!!!

*29/08/2008*

**Payîz**

Dîsa payîz vegerya ve
Rengê zer ber bû çiya
Tevrî ya me ya bi xunav e
Daweryan belgên biya

Kew ji zozana hatine xarê
Bere f deştê ve diçin
Temaşa xemla hinarê
Cerg û dil li me yê dipiçin

Yê hat wextê pila û cotî
Hem mizeyt û bêdera
Serê jorî sirê sotî
Aqar jî wek mêzera

Hevrist bi tinê hera bi xemle
Payîz bîtin yan bihar
Ji tev dara ya bê bevle
Te pîroz bîtin ew kar

Li hinde mala şeverokin
Girgira distarî têt
Pîr û can jî bi kar û kokin
Law egîdin hem kimêt

Di ken zibara axe bana
Hêj befir ne hatiye xar
Koçer dizivirin ji zozana
Kavil dimînin sar û bar

Katê hingivîn birînê
An jî doşava tirî
Bi selk û sevya em diçînê
Yê hat ewrê girrgirrî

Ewr û baran û birûsî
Tavya darêşte çema
Hemî pêgve çone lîsî
Çî zuha di berda nema

Car car roja pê dikenîtin
Car û bara zeyqete
Seyê dirr jî yê di rewîtin
Çi tûfane, meynete

"Cane merg" li bn gûza şîn bûn
Kesk bû zûrê ber dirêj
Av û hewa ji germê hîn bûn
Ji sîvanda derbûn verêj

Ya hat payîza dilê min
Dûr ji yar û gulşena
Giran barê li ser milê min
Kanê yara dest bi xena?

Kesk û sorê li ser aqarî
Nerme baran û xunav
Hûr darête evî warî
Bêhna axê bû gulav

Bêhna axa welatê min
Vê payîzê ji dûr dihêt
Lewma agir ket dilê min
Ji her dû çava xwîn dizêt.

*12/09/2008*

*USSEL*

**Pisiyar**

Min pisiyarek ya hey ji çava
Bo çî bi xemin hemî gava ?

Wan ne dîtîne hêj bihar ?
Her di bê xemlin mêrg û çinar

Bo çî bi tazîne gul li çela ?
Û hêlin li şalîla di bin bela ?

Bo çî herê bi mije sîpan ?
Û di rûtin çiyayên çoman ?

Ew di bînin wek te van kula
Wek te qehr û xemên dila

Lewa di rihyên têne xarê
Ber di bin av hemî bi carê !!

*Nîsana1977*

**Kulîlkên xwînê**

Xwîna di barît

Li tev dira
Li kolana
Li ser bana
Li ber dera
Li ser mujîlankên rojê
Li rex pencera
Li ser xewnên me
Li ser bihara
Li ser coxîn û bêdera
Li ser sêhla germe nanî
Li ser pirçê nazik esmera

Kat her şeve û ...
pêjna xema nêzîk dibîtin
Dilî merya pirî sehme û
Xwîn baran qed na bizdîtin
Tazî ji dilê sar û kavil
Na revîtin
Li ser lêvên birînên min
Ejdehakî nê paldaye û
Qed na çîtin
Dil bi xwe bûye
Parçek ji xema û
Ma kes bi xwe
Ji xwe di revîtin??.

**Pênasa min**

Wez li pênasa xwe digerhim
Da bizanim ka ez kîme
Li cihê ez lê
Wez Kurdê nifşê Arî me
Lê mirov im
Bo mirovayetiyê ez yê mirî me !!
Zulm û zordarî li kîrê bît
Ewê gavê
Bê tirs û lerz ez dê bêjim
Ez her ê kim ji wî nifşîme
Ez sor dibim, dibim Hindok !!
Gava (Şiyên)* tên kuştinê
Wez reş dibim, dibim Nêgro !!
Gava mirov li Efrîqayê Tên girtin û firotinê
Wez zer dibim, dibim badar !!
Bo kuştiyên Hêroşîma
Ku bi çekê pîs çûn mirinê

Wez di bim çêçên
Wez di bim Bosnî
Felestînî, an jî Ermen
Ku hatîne qelandinê
Wez dibime Kurd
Kurdek û bes
Katê bi jehrê
Wem li Helebçe bêyn sotinê
Katê mafê çil milyona
Li bin pên çepel
Li her çar parça
Bêt xarinê.

**şiyên=Hozeke ji hindokên sor li emrîka bi hovayetî hatbûne qelandin.*

**Ew horiya sîfet melek**

Li ser xatra çavên belek
Bûme şivan çûm ber kara *
Belkî bo me bi hêt felek
Ku dexlê me bi çît kara **
Ew horiya sîfet melek
Wez dûr kirim ji kes û kara ***
Min ew divêt wesa gelek
Neşêm ji ber wê bi kem çi kara ****
Ewê ew xetê Tuxrayê
Bo min di xand car û bara
Ji nû keftim ber belayê
Li dilî taye her êvara
Dil ê bi êş û kul û jane
Wekî gestî cotek mara
Hema carek evê bi zane
Bi zivre li me birîndara
Bi zivre sehke meydanê
Kelex pirr bûn ji evîndara
Bese, bes tu bi ke ziyanê
Bi ke rehmê li van hejara
Ger tu gul bî, bilbil im ez
Har û dîn berdam beyara
Ger tu Zîn bî, nê Mem im ez
Her di kem fîxan, hewara
Ger tu Xec bî, Siyamend im
Ketme pey kûvyê zinara
Ger tu Şîrîn, nê Ferhad im
Di kişînim xem û pejara

Ger tu Leyla, Mecnon im ez
Digerhim li çol û şînwara
Ger tu Colyêt, Romyo me ez
Dizivrim li ber koçk û diwara
Ger tu "........." Şerzad im ez
Me nav kula li ser çinara
Evroke te nabînim ez
Talana ketye bihara.

** Kar=kehir, karole kehrik, têşka biznê ya -1-salî.*
***Kar=Kara dexl û danî, bi şewazeyekê bazinane tê afrandin nêzîkî mêtrek fireh û -2-mêtir bilind e.*
****Kar=kes û kar,  xizmên mirovî ewên nêzîk.*
*****Kar=îs, şuxil, emel*

**Min dil nema**

Min dil nema, pirre ji xema, ma me çi ma?
wem derbeder
Sed ax û ox, roj ne di pilox, cerg bi kêm û zox,
xem ket ne ser
Xemên me jî, prrî mejî, ma em ji hejî ? kul û keser
Ne me bihar, dirişte ar, dirrha xirar, yêl taqe der
Ax Kurdistan, wey dilistan, hê jî li bin destan,
bê pez û merr

Wem di bê şivan, nîne xudan, xarin beran, mirna me fer
Dûr im ji yar, yal dest neyar, ya di ket hewar,
min bîne der
Ax felekê,  na bê kekê, her carekê, helke fener
Me her şeve, ceng û reve, gurgê bideve, pencin xencer
Tu çend bi nazî, sed awazî, dara mazî, her tol û terr
Got bes bêje, çiya gêj e, xema bi rêj e, tu binale her
Ew girnijî, dan ba bijî, ketime kujî, dil bû çeper
Bejn û bala, tewq û ala, rûyo xala, man bêxeber
Naçî ji bîr, hosta û jîr, ya bê qusûr, meka mefer ?
Berda me tîr, li ser me nefîr, cerg bûye qîrr, bû ceng û şer
Dûrm ji welat,  roj ne helat, xew jî xelat, bê ser û ber
Sed êş û jan, barê giran, ah û eman, sewda ye ser
Li ser me cenge, rê ya tenge, ne me denge, bû toz û ger
Bêhna tejî, ketye kujî, dil bû rejî, me ka dilber ?
Dujmin di boş in, şer firoş in, yêl me di doş in,
bizna kever

Heta kengî, em bi vî rengî, an bê dengî, man bê zever
Ser helîne, min bibîne, li me bi reşîne, misk û 'enber
Yara mecaz, ew serferaz, bi daleh û naz, dêm kesk û zer
Dêm kesk û sor, pirrçê bi nor, şevên deycor, pirrî cewher
Cerg piç piçim, bi roh û biçim, li gel wê biçim,
gorr û mehşer.

**Xem û pejara milletî**

Ma ji pejara evîndaryê, ma tiştek xweştir heye
Lew xasme ya milletî bît, yê ne dît bît tûle ye !!!

Vê xem û pejarê kuştim, hêşta hindek lewçene
Ger ne gehme yara nazdar, ma xewn jî gunhene ?

Bihêlin xewnekê bi bînim, li mi nekene jehre mar
Destê xwe dê havêm rojê, belkî dê wê înme xar !!

Nehez û bê eql û mesta, dest li min bestin çep û rast
Dê bi piya bezme miradê, pê li min gestin çep û rast

Dê ezmanê mi çilê ken ? şurekê xweş ser birre
Dê bang det bû serxwebûnê, ala rengîn hel bi firre

Ger maf û yeksan û rastî, li vê cîhanê ew hebin
Ma çima bû Kurda nînin, bo çî xem bahra me bin ?

Bo çî em her ho di nalîn, nê pîçek sûça meye
Xwe froş û kes peristîn, ma çi bêjim nê weye

Bi erzanî xwe nefroşe, ey xudanê qelemî !!
Rastî evro bête gotin, dê rizgar bîn em hemî

Milletê ax zêr û befrîn, parçe kirye dujmina
Amede bûka cîhanê, Mehabad a dest bi xena

Kerkuk hêşta di nalîtin, penaber li jêr xîveta
Ax lê zêr û zik lê birsî, ka xudanê hîmmeta ??

Rojek dê hêtin ji Kubanê, bê sinor biçime çemî....1
Paşî ser evraz bû Wanê, bû seredan biçîn hemî .......2

Ji wêrê bi çim bû Mehabad, bi cih bînim hecca berê .....3
Paşî li Seywan min bin ax ken, beram berî esmerê.

12/06/2009

*1:-Çemî =gundê min ,Çemê seyda. 2:-Devera wanê cîhê bab û kalên dapîra min (ji aliyê daykê ) 3:-Li sala 1974 ê ez çûm Mehabad mirada min ew bû wêneyekî li gorepana Çar-çira bi kişînim lê savakên şahê gorr begorr li min qedexe kir.*

**Rê dizanim**

Rê dizanim
Êketiya tev Kurdan im
Kilê çavê du Leylan im
Dawet kiriyê daweta
Mazlum Dogan im
Vexandiê nav dîwana
Mehmud yezîdî û
Qasimlo û Mame rîşe û
Tev şehîdên Kurdistan im
Rê dizanim
Ney ji van û ney ji wan im
Dengê sora û
Lor û Lik û Badînan im
Bimrim bo serxwebûn a te
Ho welato
Ne yê bi xem û peşêman im
Wez ketme derya çavên te
Li şeva tarî
Rêvinge kê bê xudan im

Dil bi êş û bar giran im
Ser gemya kul û xeman im
Ji hez kerên serxwebûnê ra heyran im
Dujminê pîs û caşan im
Dijî gendeliê û dizan im
Tuza bin pê yên pêşmerge û
Gêrîlan im
Bo Amedê Qamîşlokê
Mehabad ê dil wêran im
Fireka bayê çiyan im
Qurçeka ava kevyan im
Bo ser lêvên çar birîn a
Wez derman im
Ji alyekî ve, Ji mîrgeha
Wan û çiya yê Sîpan im
Ji alyê din ve ,Berwarî me
Kevne dareka çiya yê Metînan im
Rê dizanim
Êketiya tev Kurd a nim
Babê Sîpan û Alan im
Her evîndarê caran im
Bo serferaziya Kurda
Ne yê bi şik û bi goman im
Rê dizanim
Êketiya tev Kurdan im
Şêt û şeyda yê çiyan im
Dil bi êş û cerg bi jan im
Ji bo axa teya têhnî
Hûr baran im
Bo tevrî yên te yên sêwî
Bo kevotên te yên bawî
Wez xudan im
Ji bo rez û rêlên sotî
Wez pêjan im
Bo mamiza
Dij bi cerde û hemî diza
Wez şivan im
Êketiya tev Kurdan im
Rê dizanim
Lê bê pişt û sergerdan im
Dijî ked xara û
Xwe froşên nezan im
Gelî Kurdîn
Çi ôl bin hûn
Çi zarawe, çi mezheb bin
Bes êk bigrin
Ji hewe hemya ra qurban im
Nê xerîbê hevristan im

Yê siha sêv û bihan im
Nê wez pîr bûm
Pişt kivan im
Kes guh na dete rastî yê
Da roj bi helêt
Bo wî demî dîdevan im
Bo kudîkên te yên sava
Ji bo kanî û com û ava
Wez semyan im
Bo dîtina kêrî û gunda
Xandina pepuk û kunda
Ronahî ya çira û finda
Yê bi jivan im
Bo bêriya meşkê bikêt
Mazî çina lavja dibêt
Ew kaniya ,ji nûve bizêt
Bo berbangê spêda zelal
Zêrevan im
Bo rêving ê şeva tarî
Bo mizgîn yê derî veke
Ha nêzîke evro sibe
Wez mêhvan im.

19/08/2009

**Ma hêşta dil maye gelo?**

Gava ku yar ji min dûr dibît
Dil parçe parçe hûr di bît
Derya xema hêş kûr di bît
Ma hêşta dil maye gelo?

Ma hêşta dil dê girnijît?
An tu di bê y carek dê vejît?
Ji nav singê min di helpeqijît
Ma hêşta dil maye gelo?

Piştî mi dîtîn ax û ox
Sed Enfal û term û klox
Gavek a min ne maye şox
Ma hêşta dil maye gelo?

Hêşta birîndarê berê
Sewda ser û li pey Esmerê
Ketîme nav teqn û gerê
Ma hêşta dil maye gelo?

Ma hêşta Kurd jî ev nene?
Hind bo evî hind wê hene
Her dujminên serê xwene
Ma hêşta dil maye gelo?

Her êk bo yê dî dujmine
Hawar xudê ma ev çi ne?
Dîrok talan û kuştine
Ma hêşta dil maye gelo?

Her kes bixwe vedçirîtin
Hindê nexon zik bi dirîtin
Ava penkay dê peqîtin
Ma hêşta dil maye gelo?

Li ser sifrê wekî mêşa
Ne çav den qirş û gilêşa
Nê berr ji bin pên we rakêşa
Ma hêşta dil maye gelo?

Doz evro defter bilokin
Tijî zikî kew û nokin
Li ber xelkî çi lêhbokin
Ma hêşta dil maye gelo?

Qesr û qusîr pare û milk
An zîv û zêr manto û cilk
Li ba min hemî di bin qirş û zilk
Ma hêşta dil maye gelo ?

Pîçek rawestin li vê bezê
Hûr hûr binêrin ne bi lezê
Dayka hawar di ket way wezê
Ma hêşta dil maye gelo?

Nê hêj welat çar parçe ye
Barê min û barê te ye
Yê xemsar evro ma heye?
Ma hêşta dil maye gelo?

*04-02-2010*

**Roja bê te!!**

Gava rabûym ji xewa şirîn hêşta spêde nebarî bû
Çawa mi zanî te barkir tev dunya li ber mi tarî bû
Li perstgaha evîna te, gêj û lal mam, ser xalî bû
Nizanim qed çi bêjim ez, şine bayê siharî bû
Qamet elîf, biskên siyah, teswîrê xelqê barî bû
Siharê ba û bahoz tên, şevên reş xew diyarî bû
Neşêm qed çi veşêrim ez, ev agehe ji neçarî bû
Kirîsk dibarîn ji çavên min, li dilê bi kovan niharî bû
Li nav perya bibû şehzad, li nav durra mirarî bû
Çawa ji destên mi çû bi carê, mi nezanî eger kî bû??
Li xelkî çi geşe spêde, li dilê min her êvarî bû
Li ser belga awaz di barîn, min bes axînk li ser zarî bû
Her ew bû rewşa aqarî, hem şemala vî warî bû
Roja bêy te bi borîtin, kî di bêjît ji 'omrî bû ???.

**Maç**

Ey firîştey xewnekanim
Were em şew
Destim bigre û
Le naw deryayê
çawekant
Bim xinkêne
Her wek pêşan
Le ser şanoy
Em zemîne
Be bê dengî
Bê henase

Tenha û tenha
Be arezoy
Lêwekant
Bim dwêne.

*2009 France*

**Dîsa ji kovana dilî**

Dîsa ji kovana dilî
Îro melûl û bê ked im
Li vê ter bihara gul gulî
Sewdaser û cerg qed qed im

Li jiyara min çi payîze
Ku dar zer bûn belg weryan
Keyf û şadî ji min zîze
Der beder bê kes û semyan

Ma tu nabînî carekê
Gul çirmisîn tevda hemî
Xemil nemaye li darekê
Te çav derya û ebro gemî

Ku tîr barîn ji ebroyan
Xedengan dil kire nîşan-1
Keftim ber derdê cadoyan
Çi çav kale li rû nîşan-2

Zozaniyan mal barkirin
Li ber keviyan wan kûn vedan
Van şilêra sto xar kirin
Qed awirek li min nedan

Sewda ser û şepirzeme
Ketim nav derya kovana
Li evê şevê yê berzeme
Talana ketye hozana.

*09-06-2010*

*1- nîşan= armanc*
*2- nîşan= xal*

**Şînwar**

Car din bêy min li şûnwarên evîna min di key fîxan
Temaşake li der dora, bihar zer bû reşe asman

Binêre qurmê çinarê, ka navê me li ser maye?
Çi kel germe li vê havînê, dilê me pirrî sermaye

Bîşeng bê xeml bê nazin, ku rondik ji dehmana di barin
Çiyadirk evro sîs bûye, serê çiya xema xarin

Girê Mîr Xidrî bê rewşe, ku kew nahêne zozana
Çi talane li vî warî, kî dê vehînît hozana?

Sotik jî maye bê Nalbend, kewê Şîv Germê mit maye
Esmîn zerbûn Hevrist weryan, çav bi hêstir dilê bi taye

Pilek ji axa welatê min, bi gencîna dinê nadem
Ew dergoşa evîna min, dê çawa ji ber dilî radem?

*26.07.2010*

**Şîret**

Her Kurdê baş û camêr
Di vêt wî hebin çend xaslet
Suhbetê jî biket vavêr
Bi det yên dîjî muhlet

Hizra xo tu baş bike
Berî ku bersiv danê
Ne keve kerb û rike
Guh bide vê hozanê

Her yê rehet ya xarî
Navê baş jî bo wiye
Qeda her li nehomarî
Ma zirî jî bo çiye?

Eger êk hate def te
Û bo te kir fesadî
Bêjê ey kesê kifte
Li vêrê tu naxoy zadî

Dostê zana bê wefa
Her ewe jehra marî
Her dê jê bînî cefa
Hem tehl û tirş û tarî

Mafê xelkî bizane
Ger te pîçek xo bivêt
Mirwet jîka hosane
Her wesa aştî dihêt

Axiftina xoş bêje
Mar pê ji kunê tête der
Nanê rastiyê bi pêje
Berî ku tu bi key sefer

Qencî yê bi ke sê cara
Her çend êka zêdeye
Yê nedît bi qutê dara
Başî li gel bê fayde ye

Yê jîr tişta tê digehît
Ne hewcey pirr gotinê
Kitik neşêt qed bişihît
Dê newît ta mirinê

Mirovê baş diyare
Ji xaslet û kiryara
Ser bilind kofî xare
Naçît rêza neyara

Kanya te av jê vexar
Ne havêjê qed bera
Tu wê rade car û bar
Da avdey lûlapera

Di binî ra ne birre darê
Di vêt pîçekê tu bi hêlî
Hindî hey neke karê
Da te zik nebît kêlî

Her kesê millet parêz
Na gerhîtin li diravî
Li gel hejara dê bît rêz
Dê grît qedrê wî navî

Hindî pare û milk û war
Hemîşe her na mînin
B' tinê xasyet û werar
Tovê wan her bi çînin

Ger tu bi key gazinda
Her dem ji hemî hevala
Dê mînî wekî kunda
Dê te dest mînin vala

Ger êk bi ket suhbetê
Vêt tu guhdarê wî bî
Xo dûr neke ji mirwetê
Ji guhdan ê yê kûvî bî

Ger bigrî rêzê li xelkî
Nê ew her faydê te ye
Da ne riswa bî belkî
Çi ehmed û çi zeye

Pirr bêjî ne ya başe
Ne got gotk û qeşmerî
Ne bi cil û lif û şaşe
Da neçî rêza kerî

Ya tu bêjî bi cih bîne
Da bi te bi hêt bawerî
Paşî tu tena rûne
Belkî tacî bi key serî

Car û bara bi ke sefer
Da dunyayê bi bînî
Ne her wek mirîşka zer
Li ser hêka bi mînî

Kesê  bi ketin medhên xwe
Bawer bikey nezan e
Nêzîk dê rît şelê xwe
Heqê wî her kotane

Çendî tu bi key sepanî
Bo nehez û neyara
Dê li te bît peşêmanî
Dê ji dest dey cî û wara

Hindî derew fêlbazî
Werîsê wan yê kurte
Kirrn qed nabin mazî
Li firotinê ya çirte

Başyê bi ke berde avê
Qed tu nabî peşeman
Derî veke bo tavê
Nojdar li te nabît mêhvan

Her tu bi ke xebatê
Bo serxwebûna Kurda
Dê her gehîn necatê
Bi kare ne bi wirda

Êk girtin û rast goyî
Her eve ya ji me kême
Ez ez û hem du royî
Bo me na bine xême

Karê te kir bi cih bîne
Nehêle wî bikerê ve
Paşî tena bi rûne
Da berhemî bi key xêve

Bo Kurda ez çi bêjim
Gotina bê faydeye
Xwînê ji çava di rêjim
Her ew bi tinê min heye

Werin dab bîne êk dil
Bi êk hizr û bawerî
Boçî heval di mînî sil
Guh de gazya Xawerî

Her çend mezin jî bî to
Di vêt biçûk xo danî
Vî cilkê baş bike berxo
Bigre qedrê cîranî

Tu guh de dayk û baba
Rehmê bibe bi biçûka

Da millet bo me maba
Da bibîn dewlet zûka.

*06-11-2003*

*Kifte = dewar heke ma bê nal û sim lê kul bûn*
*Kirrin = berhemek e bi darên mazî ve di hên mîna mazya ne lê biçûk tirin na hêne kirrînê*

**Şîret 2**

Ger bijî hizar sala
Dûmahî her hêlane
Ji başyê nemîne vala
Xirabya mal wêran e
Rastiyê her bike ala
Ev şîrete çirane

Ger neban sar û gerim
Ma cîhanek da hebît
Dij bi dij req û nerim
Nihênî ha dê vebît
Wekî stêr bûn e terim
Dê êka dî xêve bît

Neke medha nezana
Eger pîçek bi mirwetî
Ne bi devî ne bi hozana
Da nebî kêla ketî
Dê te den ber didana
Dê te hêlin li ber şetî

Tiştekê gelek çivêl
Miç miça li ser xarinê
Li sênîka bi ke kêl û vêl
Çend dest pêgve hatinê
An kurtanê şor divêl
Kî pê xoşe wey li minê

Ger bi goman bî ji her kesê
Te çi heval namînin
Bes bi keve wes wesê
Perrê pîs ka bi dirrînin
Baş guh bide vê qesê
Di vêt başa bi cemînin

Qed ne bêje ezbenî
Bo çi kesa li cîhanê
Dê rû li te bine tenî
Bes xwe bêxe kotanê
An dê li te reş bît enî
Wextê biçî dîwanê

Mirov hemî wek hevin
Ma kî ji yê dî çêtire
Welew yê têkçûy tevin
Kurê kerî hêstire
Qeda f nezana bi kevin
Kurê ji babê mestire

Ger baş bûne temaşe
Nebaş bi xwe her çi nînin
Simbêla lê bi tiraşe
Nê kerin an jî di dînin
Avahyê bê helaşe
Bes suhbeta di dirrînin

Yê nebînît qenciyê
Tu li gel neke du carî
Ger jê bike hîviyê
Dê te dene ber darî
Çi bêhne ji kun rûviyê
Dûr keve ji wî mirarî

Ger carekê ji hezara
Te gote wan ne bira
Dê te dene ber dara
Dê li te ken gef û gurra
Ewin tuxmê dewara
Qed na danin çi pira

Ev min dîtin bi çava
Mixabin ne mirovin
Tafîr nabin bi çi ava
Tenê ew ji hejî govin
Çend bo bikey bizava
Bi serê te her ew hov in

Di vêt bijî du cara
Da hevala bi nasî
Hindek wek koremara
Her çend tu li gel wan xasî
Dilê wan her di çît para
Hemî stirîne û dasî

Medhe kerê direwîn
Hevalînya wî bi hêle
Ji serve bi şewq û evîn
Lê belê ji binve çêle
Her ewe sifre dirrîn
Wekî mişkê xilêle

Zanîn û mejî û hizir
Ger tu baş bi kar ne înî
Na mînin çi rêk kizir
Herdem dê ji rê vemînî
Te namînin çi 'uzir
Welew to xwe bi dirrînî

Sepaniya dujmina
Ger bikey hizar sala
Dê ji te ken her du guna
Ji mêranyê mînî vala
Dê li piştа te ken kuna
Berî te bi ken nav çala

Zanayê qelem firoş
Nifşe xesîs her ewe
Hem bê eqle û mendehoş
Heqê wî dax û kewe
Dîn û îmane qiroş
Dê wekî sey her bi rewe

Rêberê dil ket dizyê
Her du rûya lê reş ke
Mafê wî ewe bi ......
An jî çava lê geş ke
Yê bawer bi ket bi xwezyê
Tejî devê wî heş ke

Kî di zanît bedkarî
Hera mezin ka çî ye ?
Ya pîstir ji jehra marî
Ew mirovê du rûye
Her pîsatya li ser zarî
Ji mirwetê yê kûviye

Ma hûn di zanin ji xasleta
Rastî hera li pêşe
Ya baştir ji mam û meta
Welew carna ya bi êşe
Pê bi şeqîne zeyqeta
Bêhna fireh helkêşe

Bijî serbest rojekê
Ne jêr destê hero be
Bihayê te û nojekê
Eger te rûmet çûbe
Şerim ke her tozekê
Ka rojekê kurro be

Te çend heye hind bixo
Minneta xelkî pavê
Ne çi Silo ne Diho
Te na înneder ji avê
Herê reşa bi destên xo
Di vêt bikey balavê

Dostê dirist êk bese
Ne hewceyî hizara
Yê baş bo te ew kese
Herdem bi hêt li hewara
Ma bo çi ne weswese
Çi lêbkem koremara

Beramberî neheqyê
Kesê bi ritil nabînim
Başî ya hindî weqyê
Serî dê li ber çemînim
Ma çi dermanê reqyê
Her dê başa hewîn im

Bo mirova ez ax im
Da ku ew di serra biçin
Çend heye hizr û zaxim
Dê bo wan keme ripin
Vê di bêm ji dil û naxim
Welew hindek ji wan di ziçin

Ew kesê xwe pişt rê kir
Bê eger xwe kir neyar
Wî dozex bo xwe çêkir
Dê li makerê kem siyar
Kodê tehil wî têkir
Ji wî çêtire nê tiyar

Yê daresmê bi ezmanî
Hetk û heya namînin
Dê rûs beme serbanî
An dê li ser singa rûnin

Se bi xot nanê şivanî
Du çava lê bi peqînin

Milletê me jêr deste
Ji me di xazîtin xûkê
Bes binve ka tu heste
Da tu bi dey wê çûkê
Nebe terim ne xeste
Dê çawa gehye bûkê

Bûka me ew wellate
Kurdistana birîndar
Hêj roja me nehate
Bêy wê ma boçye jiyar
Ne ew wext û ew kate
Ku em hosa rûnîn xar

Ger tu nekey xebatê
Rast nebî li gel milletî
Tu nabînî necatê
Her dê bî kêla ketî
Em bi tinê ji rojhelatê
Melûl mayne li ber şetî

Kerê nezanît kere
Ma dê çi rêka jê bey
Ser tijî qirş û gere
Tu bi hêle wî têşkê sey
Ma başî kengî bi qere
Çi mitayê pîsê hey

Eger ne êsîtin ser
Ma çi hewcey dersokê
Pêle mirovê du ser
Li gel wî neçe ser cokê
Ji mala xwe bike der
Dê te êxîte şokê

Milletê ma bê rewişt
Dûmahya wî nemane
Tu rastiyê bike pişt
Nê ew karê mêrane
Her rewişte hemî tişt

Ber û vajî wêrane

Aştî li gel koremarî
Dûmahî pêvedane
Di vêt ne çiye harî
Bê mirwete y nezane
Her tu nîşa b'de darî
Tu li gel neke tirrane

Millet gelek şirîne
Belê carna ji neçarî
Wî bi hêle û xwe bi helîne
Wekî şev li te bû tarî
Bes sitemê bibîne
Dûrkeve tu ji neyarî

Millet jî wekî malê
Ger lê nebîtin tifaq
Her dê kevin nav çalê
Dê zêde bîtin nîfaq
Hevran nagehte salê
Ne xwê di mînît ne simaq

Yê bi ket dujminya babê
Desta tu jê bi helîne
Bi nifrîna tu rabê
Bê mirwete yê dîne
Nê wîjdan weha nabê
Ka serî wî bi çemîne

Te çend xwe bivêt her wetov
Di vêt sehkey cîranî
Her wesa başe mirov
Bi tinê nexotin nanî
Mirov nebît hejî gov
Guh nadete nezanî

Her derdekî dermanek

Yê hey bira tu bi zane
Her zevyekê pêjanek
Eger ya bê pêwane
Yê nebîtin wîjdanek
Guhdana wî ziyane

Ne tu ji ,ewrê girgrî
Bi keve tirs û xeyala
Ne jî ji mêrê tirtirî
Serê xwe bêxe çala
Belê wekî şêr nirrî
Bi reve hizar sala

Mirovê bê bawerî
Her tiştê wî çi nîne
Tu wî pêle li ber derî
Çi ca tu li gel ne rûne
Çi lê bikem yê hemşerî
Çi biha li cem wî nîne

Hindê bixo pê bijî
Qed nejî bo xarinê
Tewbeke belkî nejî
Ma kî dê mînît li dinê
Ma wekî ketye kujî
Ji nûka bêjî wey li minê ?

Ger tu çûy li rêka nebaş
Li nîva rê jî bi zivre
Fayde naken pişt tiraş
Welew rastiya zivre
Bê av na gerhin çi aş !
Yarê darê ne bivre

Ger avakey tu xanî
Di vêt şengista danî
Bê pêstir ne çe banî
Welew ku to xwdanî
Ger şol bûn hanî manî
Bmîne li jenga didanî

Şoleka dî ya bedkar
Firoştina jinkaye

Ey ew kesê nehomar
Ma wîjdana hosaye ?
Qelen evro bûn dollar
Hem xişêna zêraye

Mixabin bo milletî
Ketye destên nezana
Dizên ketîn qurnetî
Evro ye holka wana
Wek kewê f darî ketî
Qed bernaden zozana

Qed têr nabin çi cara
Bi Defter Biloka di xurin
Bi milhêbê yê di ken kara
Hêşta bû kayê di zirrin
Arhan wek tîremara
Herdem bi gef û gurin

Ger hosa bît ho bi çît
Sed Enfal dê hêneve
Piştî tirrê qûn bi miçît
Çi fayde naket eve
Ger kurî ya xod kiçît
Hilo bese rabeve

Rabe paqijke malê
Gêskek fere vê carê
Gilêşa tu bi ke çalê
Wekî kawe y adarê
Ser xatira çav kalê
Wê bûkê wê nazdarê

Kê ho heye dilberek ?
Dêm bihar û pirçê şîn !!
An kê heye esmerek ?
Wek ya mina pirr evîn
Hemî dunya û ew serk

Kurdistana nerm û hîn.

*15.09.2010*

*Defter = ji 10 000 dollara tê gotin !!!*
*Bilok = ji 100 000 dollara tê gotin !!!*

XEM Û XEWN Û DÛRATÎ

XEM

Li ser doşkê xema  dirûnim
Wez pal di deme kovana
Hedara xwe bi girî di înim
Stivankê hûviya di kêşim
Pirt pirt di kem
Di bizdînim
Her di xewêda
Dizanim ez
Berî mirnê evê carê
Te na bînim
Evê carê
Di kûratiya çavên teda
Binkê şenge
Helbestek nû
Dê vehînim.

## XEWIN

Xewna bere f gizîltên gerim dibînim
Hûviya li ser
Biyabanên hişk û zuha
Dê kolm û dê çînim
Çavê xwe li tev gund û şara
Li heyv û stêra
Di bem û dînim
Lê digêrînim
Te nabînim.

## DÛRATÎ

Dûratî barek girane
Salên bê bihar di hejmêrim
Devê birîna bi rondika
Dê durîm û dê veşêrim
rondika dê keme cuhnî
An bi distarî
Dê wan hêrim
Li gel şine bayê siharê
Dê virêkem
Bo çavên te dê hinêrim.

*25/11/2009*

**Ax ji nû**

Ax ji nû dil li min celandî
Guleka zêrîn kemer
Gul zerek li dora veçandî
Wekî roja tête der
Govendek têkra vexandî
Stêreka geş pê xeber

Stêreka geş hate xarê
Rojeka spêde bihar
Pêtek jê ket binê darê
Dareka xemlîn çinar
Hawar di kem gul'ûzarê
Deng veda kanê hewar

Hawar ji benda te êxsîrim
Mi girtî xuh te xunav
Du kivanên reş min li bîrin
Tîr jê barîn tav bi tav.

*1971, Hewlêr*

**Bangê Serxwebûnê**

Xewnek min dît bû hûn bêjin xêre
Ehmedê Xanê hatibû hêre
Gote min lawa bangî heldêre !!
Hilon ve Kurdîn mafî bixazin
Çima dey naken tev belengazin
Eger rast deken be rastî Kurdin
Xotan mefroşin gelêkî merdin
Soran û Badînan Amed û Sine
Hîç ferqî niye tev xakî mine
Efrîn û Koban, Duhok û Bane
Tev Kurdistane vê baş bizane
Eger wehabît di vêt bi zanîn

Şengista ji binî carek dî danîn
Ne vir ya min e û ne wir ya teye
Axa milletî hemî ya meye
Her çend ku dujmin bi hêze
Bi top û firoke û derman û têze
Sube êk bigrîn dê bîte rûvî
Panê her çûve dermanê çûvî !!
Mafê mirova bawer  pê neke
Bo Kurda nîne çavan baş veke
Reşa bi destên xwe, ger avê birî
Babê wîjdanê ji mêje yê mirî !!

*2006*

**Axa Welatî**

Bêhna axa welatê min
Paş baraneka payîzê
Ji bêhna memkên
Vînosa vîn û caniyê
Zor xoştire
Bivêna mêşekê bi tinê l
Lîwaneka
Ji nûka bi ax û pûngî hunî
Nazik tire ji sîmfoniyeka
Bîthovinî  !!
Rengê axa welatê min
Kesk û sor  zer û spiye (1)
Bila bi çin temaşaken
Ka kê heta noke ew tişt
Ne bîstiye ??

*(1) Ev her çar rengên axê li dewr û berên gundê Çemseyda hene.*

**Belkî**

Belkî bext me bi hêt carek
Berî mergî ku te bibînim
Lê yêd rêda ejdeharek
Ka bêwîjan da ez biçînim

Bê hûîvîme ji evê jînê
Bi sed waran ji te dûrim
Ku rê bûye gola xwînê
Wek goyînê ku ez di lûrim  !!

Wekî caran tê bîra min
Bişkurîna te roj di îna
Her tu maye li hizra min
Ji hemî dost û tev torrîna,

23/09/2005

**Belkî te bibînim**

Şeva dirêje şevê vethînim
Yara min kanê navê wê di înim

Bi vî dilê şkestî gerham ve wara
Spêdê axînkin di nalim êvara

Bexedem cana her te nabînim

Şevên biharê bi tinê dê rûnim

Xew qed me nema xewin pa kanê?
Xewna min tu bûy derya domanê

Roja li me borî naçît ji bîra min
Li vê cîhanê twa li hizra min

Tirsim min ji bîrkey tû li gel rondka
Gula me çandî avde bi zendka

Belkî te bi bînim gula bişkiftî
Ne ya giran bî li dilî bî piştî

Rojên biharê rojên li me borîn
Canya gulzarê bulbul bû lûrîn

Bo çî na zivrin bo kanya rûbar ?
Bo çî na hên ve bo yara dildar ?

Bo çî çav di giryên ji ber te panê ?
Bo çî dil di kevît ji ber te zîndanê ?

Bo çî min neman çi sebr û hedar ?
Bo çî geş nakey tu dil ê xembar ?

Rondik na şîn bin çi ca li şînwara
Gul dê çirmisin piştî bihara.

**Bes vekole**

Erê yarê
Bes vekole tu vî dilî
Hosa pêle û
Were guh dê çi govende
Çi şehyane
Agirê berbûy vî milî
Sot Kurdistan
Yarê bote nakem girî
Boy di bêkesîn?
Wekî berxa me difiroşin
Ma na helêt li me her rojek ?
Tev şev revînk û qele reş
Bi bin xuya
Bi keyne der
Ma na geş bît li evî warî
Gela stêrek
An bişkojek
Her bişkojek.?

**Bihar**

Bihar ya hatî û evroke sare
Bayê aloze yar bê qerare

Şeva nîv şevê dê bo te bêjim

Delal tu bizane ez neyê gêjim

Tû bo min bixo vê sûndê bi çava
Nê ez bo teme kew kete dava

Da dil rehet bît ji evê janê
Da ruh derkevît ji evê zîndanê

Da gul geş bi bin livan bax û çema
Da dil rehet bît ji van qehr û xema

Da bişêm bi jîm an her tena bi mînim
Piştî vîna te ez qed ne mînim

Tû yî neyar û dozex û qehrî
Tû yî serbar û beheşt û sebrî

Tû yî ava barana biharê
Tû yî kulîlka li ser tayê darê

Tu yî xunava li ser belgên gula
Tu yî belalêsk li ser kêrî û milla

Evro da rabîn ne bêje şerme
Bihar çend rojin nê paşî germe

Hilo da bi çînîn gula evînê
Da pê geş bikeyn berperê jînê

Bêy te bê sebrim dê mirim panê
Maçê ji te dixazim na bêjî hanê

Hemî nivistin bi tinê dê rûnim
Nebêjin boçî yarê nabînim

Ger tu bizanî ezê bi çi halim
Bi rojê li te di gerhim bi şevê di nalim

Bihara keske li hemî dunyayê
Xem bahra minin dilê li ber tayê.

*Adara 1977*

**Birinca bi şal û şepik!!**

Birinca bi şel û şepik
Tu çêke hindek cara
Bi kevînê bi çeng û lepik
Lêke sirka hinara

Bi kê dermank û goştî
Sîr û kerefs û bacan
Li gel simaqa bişaftî
Heta pirr di bîtin qazan

Hindek hestîka bi ke bin
Li gel baqilkên ter û tol !!
Bacanreşk jî di vêt hebin
Li gel filfilên zik dehol !!

Sibit gelek a başe
Bo nav birinc û dewî
Ji baxçey b'ke ya belaşe
Hindeka nevêt qewî

Hindî kulindên dirêj
Nafka wan tev der bîne
Tirşokê jî bikê hêj
Vê ni'metê tu bibîne

Îpraxên belgên mêwa
Tu rêzekê ji wan dane
Yê bi xot dê şête dêwa !!
Xarineka erzane

Pîvaza jî bikelîne
Pirke ji birinc û goştî
Paşî baş pêkwer bîne

Hêşta navik ne riştî

Hindî beql û bersilkin
Ewan di vêt ji bîr neken
Hem kelem û filfilkin
Car car di vêt xêveken

Sîrka jî baş hûr bike
Ewan jî bike nav danî
Rêvasa jî spî bike
Bîne navê yezdanî.

**Çavên te canê**

Awerên çavên te canê
Lêvên min înane coş
Mala min kefte talanê
Ah û ax ey naz firoş

Sîmayê wan çav û biryan
Kirme şêtek lal û har
Kevir û kaş bi ser min de rihyan
Mam bêmal û hal û war

Heta mirnê he dê nalim
Ax û kuvan bûn gelek
Yêk name virêke zalim
Belkî bo me bêt felek.

**Cengê kendavê**

Eve şeş sal çûn bi temamî
Agirê ber bûye wara
Hel kir agir vî nefamî
Tazya ketye ber û dara

Tazya ketye şar û gunda
Kes nema ji vî derdî xilas
Bi çep û çîr û hîl û finda
Kirin talan zêr û kiras

Kirin talan mal û zevî
Sotin rez têşkên (Efleqî )
Dad´ûrin çend têt ber devî
Koremara nîne heqî

Heqî nîne van gawira
Ne pîçek ji şerm û heyayê
Xo xilas ke ji desta bira
Da nekevye vê belayê

Tu sehke alema dinê
Evroke di axvin bi aştiyê
Teva em hêlayne bi tinê
Gelek di dûrin ji rastiyê

Bira aştî ne hosane
Ne piştî xedir û kuştinê
Li gel aştiyê em birane
Belê piştî vê gotinê:

Ew kesê ker bêneseb
Bûy sebeb bo vî şerî
Di vêt lê bi barît xezeb
Jê vekeyn difnê û serî.

*09/1986*
*Duhok*

*Dad´ûrin =qurçdan, xarin bêy ku bi cûn.*

**Çi jiyare?**

Buçîkatyê ez çi nebûm
Ku tiştekî ji jiyara xwe
Da ez bizanim

Cehêlîn yê
Ba'ssî hebûn
Herdem ceng û
Rev û ro bûn
Evîndarî qedexe bû
Bîr mi nahêt

Li gel kiçkekê
Ez gerya bim

Pîratiyê
Derbeder û
Ji nû paleme
Çi jiyara bê wata ye
Yê hosabim hindî heme.

*19/08/2004*

**Cîhan evro!!**

Cîhan evro xwîna sore
Mafên jara tên kelotin (1)
Eqil û wijdan jê bibûre
Çunkî herdu tên firotin

Çunkî herdu gelek di jarin
Lew kes pûtey pê nadetin (2)
Dê bêy herdo koremarin
Qetl û direw jî 'adetin.

*Kempa Mardinê*
*22/10/1988*

*(1) kelotin : şkandina kezana bi di dana ku bi bine du ker.*
*kezana bi keloje ; bi ke du ker .*
*(2) Pûte : bayex pêdan.*

**Çû bihara jîna min çû**

Çû bihara jîna min çû
Her melûl û derbeder
Ku çelê reş di ewrî wer bû
Nêzîke bi hêtin sefer

Jîneka pirr tehl û tarî
Pirr bi êş û kêş û bêş
Hewar ji destê ejdeharî
Bûne serdar çend gilêş

Şêst û sêyê hatin rûvî
Xwîn mêjên Be'sên çepel
Her zorî bû bi darê çûvî
Êxiste zîndanê gel

Li neh sal yê bûme sêwî
Bûm semyanê malê ez
Ku bab li min girt ewî dêwî
Şolê min bû rez û pez

Ji qutabxanê çûm ber kara
Avdan û kolan jî hem
Di çûme mazya li van zinara
Dirrk û dasî û çav seqem

Biharê da çîn soryazê
Karî û sping û hem şilêr
Beheşt ew bû li gelyê Bazê
Awazên keçkên dilêr

Bi kalk û gore wek zelama
Fi serdiketin li çelên bilind
Dest  da heyran û kelama
Keçên xurt û can û rind

Paşî hat hukmê du bira
(Arif) bo Kurda bû neyar

Yêd herêfît mal û pira
Kurdistan kire beyar

Her wan kuşt kiça Nalbendî
Li Xişxaşa bûye hewar *
Li gel deyka xo çûm wî gundî
Ax û nalênin hezar

Asya dabêy nivistiye
Dest bi hevîr bû nê bira
Wekî cangî wesa spiye
Dil li me sot pêgve xira

Siweyda her qed ne bêje
Destek jî nê berze ye
Şuna rondka xwînê birêje
Gund hemî şepirzeye

Min dît dest li bîstanê jêrî
Min îna da f pîra Fat
Got î dawa ma tû di wêrî ?
Bê bersiv mam, mame mat

Şêst û heştê hatin Be'sî
Vê carê jî bûne ker
Zulm û zordarî kir nehsî
Seddamî sot hişk û ter

Heftê û çarê çûme çiya
Dijî Be'sî me kir ceng
Hurmên di kefte van geliya
Li dujminî nema bû reng

Her wê salê çûm mehabad
Çûm tewafa çar çira
Hem savakên şahê bêdad
Har bibûn wekî gura

Mirada min nê wênek bû
Li gorepanê ez bigrim
Lê ew tişt jî qedexe bû
Da bi vî derdî ez bi mrim

Heştê û heştê hatin Enfal
Ketîn nav derdê giran

Ne rez hêla ne gund û mal
Tevda reş bû Kurdistan

Jehir di barî ji esmanî
Li erdî agir û tofan
Kelex ket bûn derê xanî
Zemezûr û hem giryan

Her wê salê derbeder bûyn
Li Aşut ê bûyne mêhvan
Paş li Mêrdîn ê sereder bûyn
Ketîn bin zulma giran

Jehir dame li nav nanî
Çar hizar bû ne xeste
Çend şehîd jî ker tû bizanî
Tû bi xudê ma ev bexte ????.

*2004*

*Ev helbeste kurte jiyana mine heta Kempa Mêrdînê 1989*

** Frokên rijêma Arifî gundê xişxaşa bombe baran kir babê min wî çaxî hêj di zîndanê da bû li Mûsil em li gundê çemseyda bûn me hawarek  gulê bû ez û dayka xo çûyne Xişxaşa me dît ku mala xalê babê min Seyd Hûseynî yên hatîne bombe baran kirin ku li nav aqarê ber gundî bûn kiça wî û herdû bûkên wî şehîd ket bûn êk jiwan Asya bû ku kiça Nalbendî bû, pîra Fatma cenaze di şuştin îna dît ku destekê Sweydayê yê kême em lê gerhayn min li bîstanê jêrî dît min îna daf wê eve sala 1963 an 1964 bû…*
*Aşut = gundek li Kurdistana bakûr, li ser sinorê bi dest hatye çê kirin,*

**Dema te dibînim**

Dema te dibînim bişkurrî
Cîhan hemî dibît ronahî
Ji çava di çin pêt û gurrî
Bo dilê min tu avahî

Dema tu di hêy û di girnijî
Payîza min di bîte bihar
Dilê tev bekroka di sojî
Bo dilê jar tu yî hedar

Tu yî çira li şeva tarî
Hem kepenê min li tehliya
Tu sivik di key li min barî
Hem fenerî li serên riya

Tu yî şirîn Sitî û Zînî
Ez im Ferhad Memê Alan
Tu yî mizgîn xem revînî
Li dilê min di key talan

Tu dilê min ji min di bey
Îşq û evîn a te gurre !!
Ger guh nedem dê bêjî wey !!
Şurê te xoş û serbire

Mijîlank tîr ebro kivan
Te pirç dav û dil jî bihar
Ger tu bêrî dê bim şivan
Da rewşen bin kêrî û zinar

Dê bişkivin mêrg û çîmen
Gava ku tu di navra diçî !!
Ber çemê bûy hizar dîmen
Ka tû horî anjî kiçî ??

*16/11/2005*

**Dibêjin**

Dibêjin li erdî
Şevrevînk ji
Kûfankê dîrokê
Der dikevin !!
Di bêjin li esmanî
Pêt dibarin
Ber dikevin
Di bêjin ejdehaka
Dest têk girtîne û
Marê sê ser
Gerrên xwe li dor
Landika me
Zivrandîne
Şev revînk
Ji ronahyê direvin
Ejdehak bi êketyê
Dimirin.

*2002*

**Dilê min Sîpan**

Dilê min sîpan bo çî ji min dûrî ?
Bo çî tu nahêy bigerrhîn li ser zûrî ?

Ezê xerîbim ji kenî û giryê te
Guha vedçinim nahêt dengê te

Ey tîrojka êvariya
Wey keviya li serên çiya

Kesk û sorî li gel barana
Bişkurrîna van zozana

Tu awazî li der geliya
Tu kulîlkî li nav tevriya

Xewna min bûy gelek sala
Suhbeta min li nav hevala

Ger bab evro te ne bînît
Sûç Seddam e ew ne mînît

Xudê cergê wî bi kuzrînît
Herdu kurra lê bi birînît.

*Çemseyda 1981*

*Katê ez ne çûyme eskeriyê ez*
*li gundî bûm devera azad û rizgar kirî*
*sîpan jî heyamekî li duhokê bû jî yê wî sê sal bûn.*

**Eketiya tev Kurdan im!!**

Kavlojankê mîrê Cinna
Jî kirê bînim ?
Da dilbera xwe xilas kem
Bo canya wê har û dînim
Ne min cilkên supermanî
Evro hene...
Da bejna xwe pê bixemlînim
Da xwîn mêjên
Vê cîhanê

Di nihala weylê da bi çînim
Ne sîmerxek evro heye
Lê siyar bim
Kêrî û dolên
Welatê xwe da pê bi bînim
Da paqij kem ji dirrk û dala
Bo şalîla ez ne mînim
Lê rê dizanim
Êketiya tev Kurdan im !!
Ney ji van û ne y ji wanim
Dengê sora û
Lor û lik û badînanim
Wez hevalê xemgîr a nim
Bordomanim li ser çewtiyê
Bo rastiyê wez dermanim !!
Wez hevalê mişextanim
Dostê kesên bê xudanim
Çima îro leşê jar û jêk hincinî
Şengista na danîn ji binî?

*Çemseyda 1987*

**Evîna min**

Evîna min
Ne xwîsara vê sipêdê ye
Gava tavê lêda bi behît
Evîna min ne sîbera spîndarê ye
Gava ba hat
Li ser dêmê
Yarê mişextbît û bi revît
Evîna min
Ne taveka biharê ye
Ho zû bihêt û
Her zû bi çît
Evîna min
Wek agirê Newrozê ye
Wek ronahya geş rojê ye
Qed çi cara na vemirhît.

**Ger em rabîn**

Ez mirovek berzeme
Îro dûrim ji welatî
Rê kûr û şepirze me
Ji nû şeva li me helatî

Şevrevînkên tariyê
Asmanê li me pirkirîn
Axînkên bê kariyê
Hizr û bîrê li me birrîn

Vêt ne mînîn bê hûvî
Guh ne deyne xuziya
Nê şêr dê bîte rûvî
Ger em rabîn ser piya

Hêza wî jî nê ji meye
Ku evro di bê tifaqîn
Ew çend har û dehbe ye
Em her bi şer û şiqaqîn.

**Gula hûviya**

Çi bihare bişkoj geşbûn
Hetav hate serên çiya
Çavên yarê di mijê werbûn
Wek xwîsara li davên giya

Gula hûvya me pêgve çand

Paşî me avda bi zendka
Çawa kulî evro çerand
Lew çav me pirr bûn ji rondika

Hizar gotnên te di weryan
Wekî zer belgên darê bûn
Hizar peymanên te neman
Wekî ewrên biharê bûn.

*Hewlêr 1976*

**Her çar werzên salê**

Katê em di çûyne çiya
Her sal werzê biharê
F ser di ketîne geliya
Êvarê di hatîn xarê

Me di îna Lûş û Soryaz
Sping û tirşok û benî
Hinda befir bo daxaz
Bi stiran û keyf û kenî

Wextê hêla maziya
Tev da rabin siharê
Agir di kefte bin piya
Da çin heta Derarê

Bi çelak û kalik û gore
Di vêt cewdikê avê jî
Nan tehînk û kurore *
Da sivik xwehavêjî

Nîvro di çûne ser avê
Da çayê jî kelînin
Hind jî da ken balavê
Da xo di avê helînin

Payîz wextê bêdera
Hem çinîna sêva bû
Bi şevê dengê esmera
Wextê şeveroka bû

Paşî da hêtin zistan
Wextê befr û baranê
Tevda spî di bû Kurdistan
Pirr di bû ji mij û moranê

Da pêgve çîn karkewê
Hem jî rava kêvrîşka
Her mexreb di keftîn xewê
Her wek tuxmê mirîşka !!!.

** kurore = nanê garisî yê tirş kirî ,anko nanê tenûrê .*
*cewdik = amanekê avê ye ji pîstê bizina tê afrandin biçûk tire ji kunê avê.*

**Hindî min dil hey**

Hindî min dil hey û hêşta pêtir
Hindî min soz hey û hêşta bi hêztir

Hindî roj bi helêt li ser kêrî û mila
Û  hûvî mabin stiran li ser dila

Min dil bo teye yara nizarî
Şev pê agehe û tava êvarî

Vêca tu were mil de milê min
Da bi hêtin bihar geş bît dilê min

Derdê evînê çendê girane
Çavên teyên geş bo min çirane

Tu bes min bi kuje hero sihara
Min şêt û dîn key berdey beyara

Hilo mizgînyê bi gehîne gula
Da ew bi mêjin xemên van dila

Bo çî tu di bêjî tu dê mi hêlî ?
Bi van axiftina dilî li min di şêlî

Sal borîn zeman her nediyarî
Pa kanê peyman sivik ke barî

Barê me Kurda du ca girane
Êk yê te yarê yê dî bizane

Kanya evînê çenda rengîne
Bihara kesk û asmanê şîne

Bi navê evîn ê û vînosa canyê
Dê vexoyn pêkve ava vê kanyê

Bo serxwebûnê ger biçîn bi hevra
Dê şikêtin zordar kelêşîn kevra

Bo çî ji tev dinê her em di belavîn ?
Bo qişk û tûrya di bîn firavîn ??.

*02/03/1977*
*DUHOK*

**Ji kûratiya xemên bê deng**

Ji kûratiya xemên bêdeng
Ciwantirîn hozana dihên
Ji êş û azarên deryayê
Kef bi ser dikevît
Li şevên tarî
Ji wê birînê
Nê dur di zên !!
Min ciwantirîn bişkurrîn
Ne dîtiye ji ya bêriya
Demê spêdê
Meşkê di kên
Bihatirîn mirov ewin
Yên rastiyê
Bi xwe herdem
Di kene hêvên.

*07/04/2004*

**Ji niho paşve**

Bihar dihên û
Xem vedrevin
Kanî di zên û
Co derdkevin
Li welatê min
Ji niho paşve
Du biharin
Du spêdene
Du êvarin
Du sîberin du ronahî
Ji heyv û stêra
Xunav di barin
Ji niho paşve
Tovê elhoya nahêlîn
Şêv a hatye berdanê
Dê katekeyn û dê kêlîn
Şemamokên sotê kevin
Careka
dî dê tam keynê
Dê ramosîn
Xakê dêrîn.

Şêv =zevya nû sote ji bo dexl û danî
*sote = zevya bi dar û tiraş ,piştî birîn û sotina dara bû genim û gundor a tê bi kar înan*

*29/10/2003*

.

**Me ne hêle**

Zivistane li jiyara me
Hemî roja
Xem di barin li êvara me
Bihar di çît
Hêj nehatî !!
Payîz di hêt
Pa ka havîn ?
Tu xelatî
Gul di çirmisin

Agir ber di bît
Tev welatî
Dil di qirqiçît
Çend bîr bihêt
Wan şûnwara
Wan kaniya
Wan sûlava
Wan rûbara
Wan keviya
Wan zinara
Wan geliya
Wan şilêra
Wan kevot û
Wan dîndara
Êdî bese bihara me
Her rojekê
Li me be xudan
Li me be hevgur
An jî semyan
An bibe jehir
Me nehêle
An jî nişter
Hero spêdê
Cerg û dilên
Me pê bi kêle
Lê bi xudê key
Me ne hêle
Me ne hêle.

*29/12/2003*

**Kî dibêjin?**

Kî dibêjîtin roj na hêtin ?
Kî di bêjîtin...
Dara hûvî û omêda me
Ber na girît...
Kanya hişk bûy
Na peqît û qed na zêtin
Kî di bejîtin
Kewê rubad
Li warê Nalbendî
Li " Şîvgermê " (1)
Careka dî
Na xurrît û na xwînîtin ?
Kî di bêjîtin şilêr li çela
Dê sîs bîtin
Careka dî wekî berê
Na şinbîtin
Kî di bêjîtin roj nehate
An nahêtin
kî di bêjîtin
Herdû memkên
Dayka welat
Berxê biyanî
Dê mêtin
Kanî biharka me kolay

Hêş em zarok
Careka dî
Dê derbît û
Ji nû dê zêtin...
Her dê zêtin...

*2004*

*(1) Nalbend gelek cara di çû Sotkî û Şîvgermê li nav bera gundê Çemseyda û Xişxaşa û Cidîdkê cihekê tena û bê deng bû, helbest li wêrê di nivêsîn.*

**Lawê delal**

Pisyarekê
Ji min dikey
Kirrên ji dilê min hatiye
Ma te piştî pîratiyê
Hûvî awat merem çiye?
Lawê delal
Baş guh bi de pîre kalî
Mafê xarî
D'vêt bizivrînîn
Em bi gopalî !!
Awata min
Ser berzî ya
Diyarbekir û
Môş û Wane
Rizgar bûna
Sine û Wirmê
Ronahiya
(Çar Çirane)

Serxwebûna
Babe Gurgur
Serxwebûna
Tev Kurdane
Tev Kurdane.

*Fransa 02/09/2002*

**Li ber kevya**

Li ber kevya û şirîn denga
Ser hizr û bîr û astenga
Te dibînim dûr li gel renga
Berze bû pêle hat bi serda

Pêlên avê rûyê li tavê
Kuştîme wê şirîn navê
Li gel pêla me dûr pavê
Me ne hêle li çol û 'erda

Dostê dilber min ne hêle
Jiyan li min bûy ava lêle
Dilê min bo te her kêle
Di dem te vê soza  merda

Bêje min vê tu biçava
Sed wekî te bi kevne dava
Nêçîrvan bim bi çme rava
Tu bes ligel min bike cerda.

*1971 Hewlêr*

**Min ji !!**

Min jişemala gul biharê
Sîbera van belgane bes
Min ji kelên vê zinarê
Dîtina van dewsane bes
Min ji çavên dostê yarê
Rondika li bin peryêye bes
Min ji destên wê bi diyarî
Ramosana savaye bes
Min ji heyvê li şeva tarî
Dîtina ber pêyaye bes
Min ji çiyayên Kurdistanê
Bes fireka avêye bes.

*?? / 12/ 1972*
*Bexda qutabxana  Al Kindî*
*Pola pêncê wêjeyî*

**Parîs nanivîtin !!**

Wek jiyarê...
Parîsê  jî wesa dibînim
Layek spiye û yê dî reşe
Êk çirmisî û yê dî geşe
Alek cane û yê dî pîre
Katê li rex " Sên " î wez di rûnim
Velerzîna stêrekê jî
Ji sermada
An ji birsada
Li nav cergê rûbarê şêlî
An li asmana
Wez nabînim

Bêhin li min di çît serê difnê
Ev Mêtroyên sar û potî
Bê dengya şeva bin erd vedbirînin
Evan canên reng lê zer bûy
"Sîda" hestî lê verotî
Pêngav xav û xwe di sîbere
Xwe dialînin !!

*Parîs 2004*

*Ji egera dûkêl û dumanê bi şev stêr li esmanê Parîs ê nahên dîtin.*

**Reva Kurda**

Hewir dibin ejdehar !!
Di serên çiya xwe dialînim
Nihal dibin
Lêhmiştên har
Mizgîniya  bor nemanê
Bo me di înin
Reşe baye çi tûfane
Roj li me zîz bû
Tehil û tûj bû
Asmanê me Kurdane
Xemeba têtin ji Bexdave !!
Bi penç û nînok û tirpane
Çav lê'd sorin
Didan di tûjin
Birsiyê mejyê zarokane
Çi dehbeye yê nezane
Dehhakê axir zemane
Rez û baxên me(1) qerfe di ket
Di bêt Enfale
Eve tola kafirane
Zeme zûr û giryane
Reşe baye çi tûfane
Axlêva (2) tirî û sêvane
Lê fermane
Zer barane
Dê bêy mije

An morane
Dîsa reva me Kurdane
Li vê cîhanê
Ne me doste
Ne semyane
Ne me rez û
Ne pêwane
Cîhaneka
Direwîn û
Bê wijdane
Bê wijdane...

*Bîrhatina 24/08/1988*

*katê Enfal bi ser meda hatîn li devera Berwarî Bala.*

*(1) Qerfe = jêvekirina gulyên garisî .*
*(2) Axlêv : despêka gehiştina tirî û sêv û ...*

**Rondik û baran**

Rondikên min
Çi êşîk û şehyanene!!
Dê ramalin tev gilêşa
Dê bin dastan !!
Dê bin memik
Li ser lêvên tev sêwiya

Dê hên dotin
Hozanên min
Di ser bilind û zor di qepene!!
Virra dadiden
Û xo bad den
Dê xo hejînin liser çela
Heta ku ew bi hêne sotin
Qed li dîwana
Van ejdehak û xwîn mija
Bê hûvî bin...
Nahên gotin
Ne firotin.

*1984*

**Sed mixabin**

Sed mixabin mi ne nyasî û
Sed mixabin mi bi nyasî !!
Ger yê dûr bim ji heft asmana
An awaz bim li gel heyrana
Ejî wekî ronahiyê
Wek tîrojka li nav tariyê
Di gerhim li hemî stêr û cema
Awata min...
Wek ya hema
Gul û gulzar
Dar û çinar
Mêrg û rûbar
Çend savayên
Ev sal û par
Tev dûr bibin ji
Êş û xema
Ji êş û xema.

*17/11/1978*

**Sîmê Mêrdînê**

Ger evro ez
Li gel vî sîmey
Axiftibam
An şiyabam
Da f dûr êxim
Li pişt tev gund û
Sinorada
Da derêxim
Da h'elînim
Keme gêsin !!
Li ser cotyar û
Hejarada
Da helêxim
Da her bêjim
Bo çine sinor
Tev kêlika
Li vê cihanê
Da herêfim
Da herêfim.

*Bihara 1989, Kampa Mêrdînê*

*bihar bû çar dewrên me sîme bû wek kotanekê ,ev cîhana hinda berfireh ji sîmey wêvetir nikarîn biçîn her du destên xo min danane ser sîmey û ev çend malke di hizra min da di hatine gotin .*

*kêlik = kêlikên sinorî, nîşanin bo diyarkirina sinora.*

**Spêda mizgîniyê**

Ji bêdengya şevên tarî
Spêda mizgîniyê dibînim
Ji girrnijîna zarokekê
Enfal kirî
Bê bab û day
Di landkê da may
Tovê berxwedanê di çînim
Ji dar berûya
Her sal sotî
Ji wan terhên
Şeng û şepal
Sed gupala dê çemînim
Dê dem destên xurt û lawa
Da gurgên har
Ji axa welatî bi revînim
Şuna her mêweka sotî
Her kevota
Darkoka simtî û verotî
Her kevoka
Ejdehara
Xwîn lê mêtî
Dastana serxwebûnê
Dê kem hozan û vehînim
Ger êk bigrîn
Li her çar parça
Rojê dê ji asmana înîn
Ger bibîn êk çi me bivêtin
Dê wê bînîn
Lê çima em her ho di mînîn
Heta kengî dê ho mînîn.

*01/06/2004*

**Tu bêbextî**

Ji 'uşaqan tu bê bextî
Were rûne li ser textî
Ne bê pîre qeda li wextî
Ya li dilê min hêşta  bihar

Hêşta bihara li vî dilî
Çava pirr ke ka tu jî kilî
Destî jî dane ser milî
Da geş bi bin deşt û zinar

Deşt û zinarên me hemî

Ava zelala vî çemî
Yê vêda tên qaz û gemî
Rengê gula nê sed hizar

Rengê gula sor û zere
Ya binefşî lûlapere
Lewma ji hemya ya vedere
Dilê me sot ax sed hewar

Dilê me sot wê esmerê
Sed xwzîka rojên berê
Bi zivrin ve  bêjin erê !!
Da geş bi bît dilê xembar.

*2005*

**Tu pirsiyarke**

Tu pisyarke ji şeva tarî
Ji rojê li wextê êvarî
Dema baran li me dibarî
Jê rûbarek kete pêla

Rûbarî ji te birim pêda
Evîn bû wek  mija spêda
Neman şînwar di gavêda
Ka xwîsarek tavê hêla ?

Çavên te girtin xwîsarê
Dilê geş gula biharê
Muxabin bi gehte êvarê
Bi kevîte nav xefk û têla

Bi derya reş hemî di gêjin
Du kivanin xwînê di rêjin
Bi lêvên geş birîn hêjin
Sax kir çemek ji nû kêla

Ji nû roj derket li gel biharê
Dar bû xemlî li der nihalê
An şemalk bû li serê salê
Geş bû li ser kêrî û rêla.

*1972 , Hewlêr*

**Wer biharê**

Wer biharê tu bibîne
Kurdistana me rengîn e
Der gelî êvarê hîne
Kevî jî rengê gewherê

Cenneta navdar pêgote
Pirr kezan û dar kevote
Av û kanî û sikr û bote
Kevir ferşê mermerê

Pir gul û çerwan û av in
Nêrgizên bişkuj belavin
Com pir pûng û deq delavin
Zevî jî rengê mêzerê

Spîndare rewşa aqarî
Teyîsî li nav şeva tarî
Stêr û heyv jî têne harî
Hawar ji destê esmerê

Mêrg û çîmen diken gazî
Berê kewa ket evrazî
Ku ew bi deştê nebûn razî
Bezîne şunwarên berê

*2005*

Teyîsî = birîqedar, ronahî da

**Xatir xastin**

Giraniya xatirxastinê
Ger dîtba kevrên çiya
Da pêgve hêne bestinê
Da her li rex şînbîtin giya

Belê bi tinê ez vê dibînim !!
Belkî tu jî li rêka minî
Zîwanê bi destê xo di çînim
Vêca tu boçî ma di çinî ?

Ger tu bi key bê dilya dilî
Bi guhore suhbeta çava
Da xoş bît dengê bulbulî
Da mest bibît hemî gava

Ev hozane ji dengê tene
Her çend a dûr bî nê bila
Ev mirîde li dewsên tene
Gul ne di harin şîn di bin li mila.

*10/11/1973*
*Hewlêr*

**Xewna min**

Xewna min ne
Sîtafka ser vî xîziye
Van têhniya gazî biket
Xewna min meşxela germ û ronahiye
Şev û roja jêk çirt diket
Xewna min rûbarekê bê dûmahiye
Biyabanên hişk û têhnî
Têr av di ket
Xewna min jî her ew xewne
Dilê min wek berê germe
Ku Kurdistan rizgar bi bît
Her wez li hûvya
Mizgînyême
Çirayê me da geş bibît.

*2003*

*Frensa*

**Zarokên enfalkirîn**

Ji evro paş ve
Ger tu bînî
Helal û nêrgiz û esmîn
Ji Kurdistanê
Tev zîz di bin !
Li biyabanêt hişk û zuha
L binê berûya( Necefê)
Tev şîn di bin
Bawer bike ewe xwîna
Wan zarokên enfal kirîn
Ew kulîlkên ji
Nû ji dayk di bin
Ger tu bînî
Kew û tivîrk
Bere f başurî yêd firin
Bo dîtina gorên bi komel
Qonax bi qonax yê di birrin
Ger tu bînî hemî di çin û
Na zivirin
Tu bi xodê ke di dûfra here !!
Li ser goristanên bi komel
Li hindav dersok û şutkekê
Yê di êwr in
Yê di bên aha li vêrê
Hevalên me
Hemî mir in
Hemî mir in

*21/01/2004*
*Frensa*

**Yê dibêjin min**

Yê dibêjin min
Behsê serxwebûnê neke
Nê biveye
Yêd bêjne min
Vê birînê nevekole
Gulolkeka pirr aloze
Ka hel neke
Tirs tê heye
Yêd bêjne min
Ew bîşekê
Gelek çirr û pirr dehbeye
Yêd bêjne min
Vê rê berde
Dujmin seyê dirindeye
Eger min bi kene cehnemê û
Hestîkên min baş bi kelînin
Ger min pirt pirt ,
Let let biken û bi gemrînin
Ger hêşta rahêlne min û
Min ji cîhanê
Rateqînin
Her dê navê serxwebûnê
Li hemî dira
Dê nivêsim û
Dê înim
Her peya rêka hûn bi çinê
Li welatê min
Li ser her kevr û
Qurmê darê
Her cihê ku temaşaken
Dest xetê min
Dê lê bînin
Dê lê xwînin.

*2004*

**Belkî rojek**

Ew çav şîna ku ez kuştîm
Di xewnê jî da na bînim
Ji dûrya wê nê buhiştim
Wekî goyînê ez di xwînim

Wekî goyînê ez di kalim
Bi şev û roj û spêde û êvar
Bê zar û her bi tinê di nalim
Hero di bêjim xuzîka par

Belkî rojek li min bi helêtin
Di rêka te bi kevim carek
Kanî biharka me bi zêtin
Lê nemabît ejdeharek

Ewê rojê dê bît bihar
Dê xemilin kêrî û çiya
Dê bin mêzer deşt û zinar
Dê ken sema gul û giya

Belê di tirsim mi ne nyasî
Nê rêvingê şeva dûrim
Di serî jîra neman dasî
Melevanê derya kûrim.

02/01/2006

**Bese êdî !!**

Li kenarên kesk çavên te
Hespê omêda girêdem û di çerînim!
Li ber verêja rondkên te
Aqarekê hûvî û merema dê çînim
Xweziya (Xanî) dê avdem
Tovê bekroka ji axa welatê rengîn
Dê birînim
Hemî stêra dê gazîkem
Ahenga şenge (Leylayê) 1
Ji ewê şevê dê cemînim !
Ji stêr û heyva
Stivankekî dê bû çêkem !!
Ji ronahiya birûsiya
Dê vehînim !!
Rez û baxê (Cîhan şahî) -2
Ji nav çîrokên
Kurdewaryê
Dê rakêşim
Dê der înim
Ew periya lê binîşît
Êdî serbest bi zivrît ve
Kul û kovana bes bînît
Bes kavlojank bên dizînê -3
Warê mamiz û kûîviya

Bese êdî gurg bi çerînît
Bese êdî ho bi mînît.
Bese êdî ho bi mînît.

*30/12/2003*
*Fransa*
*1-Leyla Qasim,ke nimoneke bo hemî jinên Kurd ke şehîd bûyn li her çar parça.*
*2-ji çîrokeka kevna Kurdewariyê.*
*3-kavlojank = cilkên perîkan bo di kirne ber xo bo firînê di çîrokên kevin de.*

**Bilindahiya bejin û bala**

Bilindahya bejin û bala
Çavê şîn derya ya kûr
Kuştiyê wan non û xala
Li warê îşqê bûme mîr

Bûme êxsîr ketme dava
Zulf û biskên ta belav
Nîvro roj li min di bîte ava
Çend wê dem bigrît xunav

Çend wê rû sor bin ji şermê
Şeva tarî di bîte roj
Ew ronahî di det min germê
Li rojê di zivrît gul beroj

Min dizanî ya dilê te
Lê payîz bû li vî dilî
Min dest dana ser milê te
Bihar hat vî milî

Wez dizanim çend bi nazî
Wek fira bayê seher
Hem dirindey wekî bazî
Wextê penca di înye der

Katê tîr di barin ji çava
Nîne qelxan bête ber
Ma wekî kew kefte dava
Fayde naken çeng û per.

**Bîra mi têt**

Bîra mi têt
Li pişt gundê me
Kanî bihark
Her sal dizan
Me kûr dikirin
Paqij dikirin
Sifk û bêla ava dikirin *
Nav lê dinan
Co jêd birin
Me dikir deloş *
Me tov nimand û havêtê
Paş çend roja
Roj xinzirî
Zûr kuzirî
Çûm şûnwara
Da tên demê *
Tenê morîkek ji gerdenê
Ma bû li wara
Li gel bendoşka berbenê.

*20/01/2007*

** bêla = xanyê du tebeq .*
*deloş = zevya bo cara êkê çandin têda kirî û kirye birinc.*
*tên demê = temaşakem.*

**Bo çi an bo çi nemirim**

Bo zarokên me li Helebçe

Li ser destên babê nehên parastinê
Bo jinka Kurd
Li bin pistalên pîs dujmina
Ku têtе perçqandinê
Bo goristanên bi komel
Li tev welatî hatîne der
Li Kurdistanê
Gazya Ehmedê Xanê
Ji nav şi'r û dîwanêt wî têt
der xistinê
Hêsan nîne dilê Çil û çar milyona
Bêt sotinê
Hêsan nîne
Cok jêhel biçin
Rûbar bihên pengandinê
Ne rastî berze di bît
Ne roj bi moxila kun kun
Têt girtinê
Hêsan nîne
Xewnên zarokatya min
Ji ber lêva Nihnihk î (1)
Bên revandin
Hêsan nîne
Bêhna esmîn û beybûna
Ji ber difna min bêt birandin
Ne hozanêt mîr Nalbendî
Ji " Sotik " û girê " Mir Xidrî "
Tên firandin
Ne belgên hevrista tên werandin
Ne kewê " Şîvgermê " çi car
Mişext di bît
Ne agirê Babe Gurgur
Çi car di dilê meda nahêt
Vemirandin.

*(1) Nihnihk rûbare li devera Berwarî Bala*
*di ber gundê Çemseyda ra derbaz di bît.*
" Sotik " û girê " Mir Xidrî " = wargehên Nalbendî ji bo helbesta li pişt gundê çemseyda .

**Çavên yarê**

Çavên yarê
Wek deryaya
Bê dûmahî
Min radkêşin...
Wez rêving im
Ketme şeva tarî
Ketme dumana êvarî
Çima bê geştî wez lê di çim ??
Berzeme nemelevan im...
Têhnîme av her li me sûre
Tehle... jehre...
Gizîlte di dûr û bê çarim
Manê lewma
Pişta " gamasî " di keme (1)
Doşk û li ser di rûnim
Bila bi zanim ...
Bi werîsê xelkê neçe
Hişke kevrî
Vê jî dizanim
Belê çi bikem
Dildarekê bê xudanim
Çavên yarê sewda kirim
Lew ma bê ser
Xu di ha vême
Rêka dirêj
Rêka hat û hem nehatê
Rêka pirr dehbe û qirêj
Axînkên min

Wek rûbarî
Tên êvara !!
Ho rûbara...
Bes bi kale
Bes bi nale
Gelyê kûre û
Şev di dirêjin
Ez û tu herdu
Rêvingîn... !!

*Çemseyda 1974*

**Çi dergeh**

Çi dergeh evroke mane
Ku me Kurda ne qutabin
Were rastiyê hemê bi zane
Eger rastî hêşta mabin

Bûyne xerbî ta ser êsqan
Me got ev rêke ya başe
Hêşta yêl ser aşî hevran
Bi sermeda hat kevr û kaşe

Paşî me çepda bo çepî
Da hawrê desta bi helînin
Wanjî em hêlayne bi lepî
Got hûn ne dostên Lînînin

Berê mekefte îranê
Got em hemî bislmanîn
Paşî em radayn bi dehmanê
Got tev Kurda dê birînîn

Vêca çi bi keyn ? kîve bi çîn ?
Bo y hûn dermanî nabînin ?
Bo çî hinde di nerm û liçîn
Bo y êketyê na pejrînin ?

Kew dujminê serê xoye
Çend cara hate gotinê
Ger hobîn milletê çûye
Wek miha dê hêyn dotinê.
*17/06/2004*
*êsq = hestî*

**Çi maf hene an dêmînin**

Çi maf hene an dê mînin
Katê xewin di bin ejdehar !!
Xo di spêdeya jiyara me
Baş bi alînin
Çi maf hene an dê minin
Katê kotir di bin heftiyar !!
Tovê tirsê
Li asmanê pan û berîn
Belav ken û her bi çînin
Çi maf hene an dê mînin
Katê roj pişta xo bi det me
Kew û şalîl êdî
Li xopana welatî
Qed nexwînin !!
Çi maf hene an dê mînin
Katê mirov di bin seyên har
Tirs û sehmê
Bi ser zaroka da di barînin
Çi maf hene an dê mînin
Eger mirov
Ji milletê xo bi revîtin

Çi maf hene an dê mînin
Ger hozanavan
Neşêt rastiyê bêjîtin
Bi çi bawer kem
Eger hêşta
Gerokekê rûs û birsî
Li ber dergehê dewlemenda
Ji birsa bimrîtin
Çi maf hene an dê mînin
Ger gelê me li
Babe Gurgur
Hêşta li bin xîveta bijîtin
Çi maf hene an dê mînin
Eger sera hizr û bîr û
Deng û renga
Hêşta mirov
Li ber dîwara
Ji birs û sirrê
Hêj bi mirît in
Bi çi bawer kem
Ger alayê Kurdistanê
Li Niyoyork û Birokslê ne bilind bît û
Ne hejîtin.

*18/03/2004*

**Delal dilê min**

Delal dilê min te kîve bire
Bo min bi zivrîne cergê bi agire

Stêra li dilê min her tu ya geşî
Ji ber te bêzarim agirê li leşî

Kengî biharê dê pêgve bînîn ?
Roja me bi helêt gula lê bi çînîn

Sûnda min xarî bi rondkên çava
Piştî vîna te ez  ne bim zava

Belkî tu hêşta bawer ji min ne key
Eger dilê min dav dav dê şe key

Evîndar neşêt qed çi veşêrît
Ji çava diyare rondka di hêrît.

*Hewlêr 1976*

**Dengê yarê**

Dengê yarê hozaneke
Stiraneke
Belê di bêdengin evroke
Awazên me
Dar girana ma çi di viya ?
Ji te çi di viya ?
ji min çi di viya ?
Ewan di viya
Ser jê bi ken
Hûviyên me
Dilê min û te jêk veken
Da bizdînin
Berzeken kenî û giryê me
Girî ez m
kenî tu yî
Eger bi grîn

Eger bi kenîn
Her du bi destê min û tene
Hilo jengê ji dilî bi renîn
Keyf û şadî li hûvya mene.

*11/08/1977*

**Devera Berwarya**

Li rojhelatî Zêy Badînan
Li rojavay Xabûre nê
Başor çiyayê Metînan
Bakûr jî Hekare nê

Bazê gundek gelek xoşe
Dergelî spîndar û av
Ava aşî hinda boşe
Li bazê hemyê di ket xunav !!

Kanya ta da biçîn bi bînîn
Hem derman û merheme !!
Êvarya li bin gûza bi rûnîn
Nê bihara her deme

Çemê seyda li ser helana
Zivistan xoş û zuha
Havînê di çîne zozana
Her sal di guhorîn ciha

Sê keravên avê lê ne
Nihnihk û nê herdu şîv (1)
Wextê zerî ji bêrê têne
Dilê merya di bîte xîv !!

Can û pîr xwe di êxin avê
Melevanin tev hemî !!
Hindek çêdken xoş gulavê
Ji wê gula li Hefşkî û Çemî

Gelîk jî gelek dêrîne
Nawiskên dewrê berê
Sê sûlava lê bibîne
Kesk û sor jê di çît derê !!

Here Ore nê zozane
Vexo ava kaniya
Pirr giya û sping û çerwane
Wek tev xakê Mîdiya

Qumriyê pirr şkeftên dêrîn
Di berda gûz û dar û bar
Hem esmînên belg zêrîn
Wextê di borîtin bihar

Here Kêste li ber zinarî
Di berda Xabûrê delal
Dengê kewa li hemya barî
Ger spêde di bîte zelal

Ormanê her çenda hişke
Pirr kezan û rez û pez
Bo doşavê ew ser pişke
Di bime şahid bo vê ez !!

Ger tu Nalbendî di niyasî
Bo Xişxaşa bi ke sefer !
Li wêrê gorrê çak û xasî
Çawa hozan di bin fener ?

Gelyê Bêşîlê zor hîne
Aveka spî û tezî
Here li wêrê merda bibîne
Di vêt bi rûnî çend bilezî

Edinê hîn û bilinde
Di berda gelyê bi nav û deng
Serero jî kite gunde
Camêr û xurt û çeleng

Hetirşê gundê du aşa
Gelyekê pirr av û hîn
Hind di çinin kunci û maşa
Carna aşî di ken tehîn !! (2)

Çûm Derarê li pişt Hirorê
Zomeka hîn û berîn
Ji awerên wê kiras morê
Em tevda bûyn şêt û dîn

Li rojhelatî Zêy Badînan
Li roj avay Xabûre nê
Başor çiyayê Metîna
Bakûr jî Aroşe nê

Kurdistan hemî beheşte
Ji Qamişlo heta Sine
Omêda min her êk tişte
Ku sinor bi bin tune !!

*27/05/2004*

*(1) Nihnihk : rûbare ji kanya Mûska destpêdiket heta digehte Xabûri.*
*herdû şîv  : şîva Seferya û şîva Bazê hersêk li Çemseyda di gehne êk.*
*(2) Aşen avê bû arî ne lê payîzan hindek aşa tehînê pê çêdken.*

**Dilê min dilman**

Dilê min dilman şev çend dirêjin
Hindî jê biçin dê bêjî hêjin

Dilê aloze bi xemin herdu çav
Gava bi nesaxî ez çûyme hindav

Gava min dîtî bê hêz bi wî rengî
Boy na girnijî tu bo y bê dengî ?

Nê tu kulîlk bûy herdem defkenî
Ez û day her du bi te bi bûyn xenî

Bi ......   dibêjît duxtor nesaxî _1
Çima ron nakey hinde bê zaxî

Şeva bê denge pêjna xema têt
Lew her bê hêzim mi qed xew nahêt.

*14/05/1984*

*Nesaxiya kurê min dilman î li nexoşxana duhokê*
*pizişka em tirsandin lê wesa nebo wekî wan gotî*
*1.... pizîşkî bi inglîzî tiştek di gote hevalê xo em tênegeheştîn çî bû .*

**Dijmin kî ne?**

Dujminên me Kurda kîne?
Perdê ji ser rake û bi helîne
Ji wîjdanê tev di bê behr û
Ji mirwetê di qemoxtîne
Ger çi helamet wek şêrin
Lê bi rastî jî pîs rûvîne
Mafê çil milyonan di xon
Gurgên borin
Di pîstê mihê !!
Di nixaftîne !!
Serxulole û
Wekî gûzê
Di qewrandîne
Dîroka wan
Ger sehkeyê
Şiltaxa mêşaye bi dûve !!
Ji dûrve dizanî
Ku di gurrîne.

**Evroke**

Evro me sehkir rojê
Rojeka sar û bare
Evro talane li hozê
Ji welatî bûyn aware

Belav bûyn li tev cîhanê
Bê semyan û derbeder
Ji amrîka ta îranê
Her Kurde may bê dever

Cara sedê dê bêjim
Her dê bêm û bêjmeve !!
Hişyarim wez ne gêjim
Dermanê me bes eve..
.
Bes êk bigrin bi bin êk
Pênevêtin şer û ceng
Her ev bi tinê maye rêk
Wer in xurt û law û şeng

Wer in pêjankeyn rezî
Gurgê borê dev beşe
Dê xotin tirî û pezî
Bê mirwete y zik reşe.

*24/03/1994*

**Ey delalê**

Ey delalê tu were
Seyranekê bi beyn çiya
Te bi evînê bawere
Bi her dû biskên li ser rûya

Sing befir lê bûy bihar
Ne heyfe hewdik bi behît
Ev betena lê xûsar
Wexte sor gul bişkvît

Roj dê çîtin bi silave
Wexte stêra bû hela
Gul dê çirmisît bi xunav ve
Dê li biharê bît xela.

*1972 Hewlêr*

**Ezê li hêvya te**

Ezê li hûviya te çend şev û roja
Bendkê vî dilî nê xema koja

Spêdê ji xew rad bim her te nabînim
Lew ji her du çava rondka di barînim

Ji roja pisyarke çawa di borin ?
Ewjî wekî me ma her di mecborin ?

Me xewa şirîn herame li çava
Vê nîva şevê ez ketme dava

Delalê kuştim bi şevê xew nahêt
Suhtim bihiştim kovan danahêt

Şeva bê denge bi sehm û tirse
Bi gehme miradê mirad ne birse

Yar im beyanî dil im her tenge
Le yad im naçê bexwa em denge

Eger ji min dûr bûy dê pirsim ji stêra
Yara min kanê ? reben çûn dêra

Çend zehmete bêy te yarê jîiyan
Dilê bêzare bi taye giyan

Dê hilo rabe rewşa aqarî
Dê hilo rabe xemla nizarî

Evro bihare û tu nediyarî

Tovê axînka lew di çînim li warî.

*1975*

**Ger ji destê min**

Ger ji destê min bihêt carek
Li şev bêrya te, bi bim mêhvan
Dê bêm heyve sed tebarek !!
Ku nînin ho ne îns û can

Ne îns û can, ne Leyla û Zîn
Ne Vînos û , ne Zuleyxa
Ne Colyêt û Sitî û Şirîn
Ne li çi dem û nel çi çerxa

Ne bû kes wek te naz firoş

Lewma bê hêz û keftîme
Bi hizaran kes man mendehoş
Pisyar naket ka ez kîme ?

Awirek bide li bîmarê xo
Sûlav zozaneka hîne
Dilê min bi ke warê xo !!
Navê te bi xo feraşîne.

1974

**Girtina kûçkê Bexdayê**

Mizgînyê bidene şehîdan
Îbinul (ôce) y qur beser
Ket destê şêr û egîdan
Me pîroz bît ev xeber

Hat dûmahya zulm û zorê
Zivistan li me bû bihar
Xûn mêj di kevin bi evê corê
Hem Dehhak û tev mirar

Mizgînyê bi dene Helepçe
Hem Soran û Badînan
Ketin destên wî kelepçe
Evro cejna me hemyan

Evro cejna ber û dara
Hem rûbar û kaniya!!
Ew rizgar bûn ji dîn û hara
Wan xûn mêjên Bessiya

Dad kirna wî divêt li Helebçe
Ew dizanin mirwetê
Qêr yêt wî bi gehne Şelemçe
Da hemî bi ken î'bretê.

*14-12-2003*

**Gundê mino**

Gundê mino
Bîra min têt
Qerfa garis a û şeverok
Dengê kew a û mazi çina
Ew dildar a di got heyranok
Li Ser Helana
Danqutan bû
Hem kelandina danîka
Kanîka 'Eyşê zozan bû
Li Ger Zivirkê
Xwe têxist avê biçûka
Garis ji karê tate xarê
Himbank di tijî nîsk û nok bûn
Hind di pirr dexlin bû savarê
Hind pirr tehle û hem genmok bûn
Lînkê qelyê li bin stêrkî
Ji rexve cerê vê doşavê
Carna hirrên di kete girrkî
Beqe beqa cerê avê
Hem gelwazên van hijîra
Dîz jî di pirr bûn ji xweşavê
Bih û hinar di bûn tilove
Bêhna şirîn di kete xanî
Pê geş di bû jîna mirove
Dengê dîka di çû asmanî
Çi awazek heye xoştir
Ji dengê reşwêla li biharê
Çi awatek heye fer tir
Ku ew bi gehîte dildarê.

*2003*

**Hozanek û spêdê**

Ey dilê min
Rengê dunya yê êvare
Rôjê perrê xwe da hêla
Bînahiya min
Ev havîne gelek sare !!
Van axînka
Dilê min mêt

Dilê min sot û kûr kêla !
Dewr û berên me stirîne
Ev cîhane
Deryayeka pêle dare
Bi tinê gemya xo lê di bem
Û  lê di înim
Li şeva tarî
Li ber ronahya birûsiya
Hôzanekê
Bo spêdek geş
Dê vehînim .

**Ji nalêna**

Ji nalêna helbesteka serjêkirî
Ji velerzîna stêreka rûs
Ji serma mirî
Min dît perrekê kengirê
Sivk û lawaz
Zarokekê Enfal kirî
Li gel şine bayê spêdê
F perr keft û firî
Ji axînkeka
Bi şerm û damay
Ku hetav sorka êvarê
Li gel xo werpêçay û birî
Şîn di bît hûvî
Geş di bît Newroz
Çiya di bi ne pêt û gurî.

*26/01/2005*

**Kanê!!**

Kanê ew rûbarê renga ?
Çi lê hatiye
Sîtafka me
Kanî hemî di pirin ji denga
Sîber nîne, sîbera min
Her êk roje
Li hedara min
Wek di helêtin spêdehiya û
Her ewe tête hewara min
Li tengaviya
Di bê pêjnene hozanên min
Her dibê dengin
Birînên  min.

*31/01/1978*

**Kerê xiyanetê**

Cuha rabû spêdye
Kerên xwe ji mal der anîn

Eqlê wî bi xwe hindeye
Bê xandin û bê zanîn

Ker berdane garranê
Ewjî li êkî siyare
Carekê wî got kanê
Da kera bi kem hijmare

Ker hejmartin bûne şeş
Gut yê dî gurgî dirrand
Ji kerî hate xarê xweş
Garan wî lêk zivirand

Paşî ker ji nû hejmartin
Hejmara wî heft temam
Dem çû, cih lêk guhartin
Wek sergêjê li nav hemam !!

Car din rê lê berze bû
Got nê kerek nemaye
Ew bxwe nê lê siyar bû
Xiyanet jî wesaye

Yê lê siyar nabînît
Di vêt êk wî hişyar ket
Da tovê pîs ne çînît
Ber det wê rêka xelet.

*1998*

**Kurê mino**

Kurê mino...
Ger hat û pisyara tekir
Mamostay...
Bi dengekê damay...
Kîş welate li vê cîhnanê
Heta evro li bin desta may ??
Welam bide û
Bêje Kurdistane panê
Lawê mino
Ger gutne te
Tu ji kîrê hatiye û rev yay ?
Hosa têhnî û hem westî yay ?
Bêje ji wê bûka cîhane
Ger got ne te
Geştirîn stêr
Li kîş asmanî

Têne dîtin ?
Ger got ne te
Merd tirîn mêr
Li kîş welatî
Têne kuştin ?
Her dem bersiv
Li Kurdistanê.

**Lêvên geş**

Lêvên geş canî nehêla
Rû sore ji rengê şelêla *
Dil li min hûrkir ji nû kêla
Ji axînka dil bû beyar

Du hewdên spîndar a ne çav
Hêj spêdeye belgin bi xunav
Ta bilindin bejna zirav
Min ji cana yare bijar

Min ji dosta yara girtî
Babelîska xûsar girtî
Dil ji min bir wesa bi xurtî
Çav reşê ya gerden zinar

Çav reşe girtim û hêram
Ji awrya qed newêram
Li dor dunyayê wez gêram
Wez bûm pepûk ez bûm hejar.

*Bexda,1973*

** şelêl= şilêr =Gul nixwîn,şaha gula gelek nav hene tê guhertin ji deverk bû ya din .*

**Li ber kevya**

Li ber kevya û şîrin denga
Li ser hizr û astenga
Te dibînim dûr li gel renga
Berze bû pêle hat bi serda

Pêlên avê rûyê li tavê
Kuştîme wê şirîn navê
Li gel pêla me dûr pavê
Me ne hêle li çol û erda

Dostê dilber min ne hêle
Jiyan li min bûy ava lêle
Dilê min bo te her kêle
Di dem te vê soza  merda

Bêje min vê tu bi çava
Sed wekî te bi kevne dava
Nêçîrvan bim biçme rava
Tu bes ligel min bike cerda.

*1971 Hewlêr*

**Meşa Kolin**

Wer bibîne
Nê Kurd Kurdê duhî nîne
Meşa kolin temaşake û baş bi xwîne
Her çend kêm bûn
Lê bi rastî jî bihayê wê yê kêm nîne
Li bin alayê Kurdîniyê
Yên xir ve bûyn
Ji her çar parça
Eve rojên dîrokîne
Were bibîne
Nê Kurd Kurdê duhî nîne
Katê Amed gazî biket

Silêmanî dê li dûv hêtin
Katê hewlêr di xwînê werdbît
Mehabada bi bersiv têtin
Katê sine bêjîtin ah
Gola Wanê dê kelîtin
Katê qamîşlokê bi sojît *
Duhok ji qehra dê nalîtin
Katê şirnex ta bi hêtê
Pîranşehir dê bijrîtin
Were bibîne
Nê Kurd Kurdê duhî nîne
Meşa kolin şiroveke û
Baş bixwîne
Mijîlankên wanê di reşin
Babe Gurr Gurr dil birîne
Bo azadya Kurdistanê
Dê xo sojîn
Ger sed Enfala jî bînîn
Her dê bêjîn qed çi nîne
Êketya me ger çê bîtin
Me pakî bi dujmina nîne
Me pakî bi rû reşa nîne.

*09/02/2004*

**Nerme baranek**

Nerme baranek ji asmana
Me got babo belkî bêtin
An firek bayê zozana
Kanya warî da bizêtin

Bihara min tuyî yarê
Ke çî evro na girnijî
Roja me diçîte êvarê
Dê bese nê ber buhujî

Nerme dilop bera di simin
Ger çî tu hêşta hişktirî
Bes awirek tu bi de min
Dê sax bîtin dilê mirî

Ey dilberê ma ne bese
Li hûviya te mame çend sala
Bi derdê dilê min tu bi hese
Da bi revînîn dirk û dala

Her rojeka bêy te biçît
Ne ji jiyê min bêt hijmarê
Xemla gulê dê qirmiçît
Talan dê kefte buharê

Eger rojê her sê cara
Çavên yara xo ne bînim
Bê ser dê gerrhim li şînwara
Tovê axînka dê çînim

Katê te dibînim bişkurrî
Şeva tarî di bît ronahî
ji çava diçin pêt û gurrî
Bo dilê min tu ronahî.

**Rast e**

Raste dîtna me careke
Bişkiftin belgên sor gulê
Ka bê dilya dilî neke
Kuştim biriştim çav kilê

Ev dire ma bû tijî bît
Ji çîroka dilî belê
Dil dê li min çît roh belav bît
Çendî bi bînim vê mil ê  !!

Ma her hosa bi êk carî
Cerg û dila li mi dibizdînî
Wey çav reşa wekî marî
Ma tu halê mi nabînî ?

Zer û potî behtî mam
Ji ber awrên çava ketim
Wextê çûy dil şewtî mam
Mala wê jî  vêneketim !!

*31/12/1972*
*Bexda*

*mil = gird, gir berzahiya erdî*

**Reşe ba**

Reşe bayek evro dihêt
Li min babo bi kerb û kîne
Li asmanê Kurdistanê
Nê firîna firrok û dehbên kûvîne
Çi xewneka dil bizdîne
Were bibîne
Êvar bi sehmin
Şev bi tazîne
Gula hûvî û ûmeda me
Hera sîs û
Ser nixûne...
Çavê dayka me li Helebçe
Pirr rondk û
Dil bixûne
Cîhan hemî
Li me pişt rê ye
Ger we nebît
Navê êkî bi tinê bîne
Azadî xaz kanê kîne ??

*Çemseyda 1988*

*Xewneka giran sala 1988 çend rojeka berî Enfala Badînan*

**Vedem pirrçî**

Vedem pirçî li ser rûyên te
Paşî rawestim çi bêjim ?

Çav dê tirsin ji çavên te
Têr vexom ji lêva bi mêjim

Têr vexom ji kanya biharê
Jêhel bexedem ber çela
Tavek barî ji vê zinarê
Heyva bi nîvî ji nû hela

Vîna bi şerim pîroz bîtin
Çava ne bînim ji şermê
Da dilê min ji min dûr bîtin
Li gel xo bi bet da bi gehmê.

*02/01/1973*
*Hewlêr*

**Tu kanê?**

Ey delala min tu kanê ?
Pirr xerîbim bêy te yê dîn
Min dît tehlatya jiyanê
Hem bê sebr û hez û evîn

Ji te dûrim bi sed waran
Nerme dengê te hêj tê min
Hêstir di barin wekî baran
Çend ku tu têye hizra min

Di bên ev şeve dê barîtin
Taveka nerme baranê
gurg bo heyvê dê lûrîtin
Talan dê kefte zozanê.

*26/04/2006*

**Werin zarokên Kurda**

Werin zarokên Kurda
Bo we bi kem behsên berê
We kulturê xo ji dest da
Da vekeyn vê pencerê

Jîna kal û babê me
Di vêt em baş bi zanîn
Hem rêncberya diya me
Ma bo çî em di hosanîn

Xanîkê can û biçûk
Navbra wî jî tane
Di helwasîn sêv û hulîk
Hem tilovên bihane

Stêrrkê tijî himban ke
Hem dexil û cih û kuncî
Li ber kuçkî dana xank e
Di rûniştin ser kûrincî (1)

Li distarî jî hirr hirre
Savarê ji ber di peşîtin !! (2)
Li sopa dara mirr mirre
Gup gupa ji derî di çîtin

Cuhnî di quta du zerya
Hem dan qut û kezanin
Meşk jî di kiya du perya
Lavjên ciwan ji dizanin.

*29/09/2003*

*(1) kûrinc : rayexek bû ji hirya berxa (liva) yê çêdkir.*
*(2) peşît : ji ber diçît bi hêz.*

**Xewna êkê**

Dara berû...
Zarokek bû ji serma digirî !!
Şevê dehman tê aland û
Heyvê çîroka xo bo digot
Talan ket bû mêwa tirî
Rezvan ket bû xewa giran
Lewma hirçê
Miştaxeya
Pirt pirt kirî.

*1977*

**Tenha tu yî**

Tenha tuyî yara berê
hawar jî destê esmerê
Demê ku tu li ber pencerê
Li min neman sebr û bizav

Li min neman sebr û hedar
Bi şev û roj spêde û êvar
Ne min xewe û axînk hizar
Hizr û bîrên min bûn belav

Hizr û bîrên min têk diçin
Dil û mêlak jî di qirqiçin
Gava ji zozanê diçin
Ji çava dizêt cûbar û av

Ev dûratya te kujeke
Carek dilê xo li min veke
Soza berê ne berzeke
Careka dî tu bike silav

Care ka dî bi çîn wara
Bi çîn şînwar û nizara
Bêhna kulîlk û gulzara
Ew nêrgiza bejin zirav

Ew şilêra ho şox û şeng
Li gel tevriyê wê şer û ceng
Li kewê rubad nema bû deng
Lê girtibûn rêk û derav

Rêk û derav jî tune ne
Hizar xefk û dav jî hene
Hindek telhe jî di berzene
Çavên xumar girtin xunav

Çavên belek pir 'îşq û vîn
Dîtina teye ku xem revîn
Bîmar bi dengê te vejîn
Bêhna teye misk û gulav

Bêhna te misk û 'enbere
Çavan li gel biryan şerre
Ka carekê hêrve were
Derket  ji pişt ewrî hetav.

**Sîbera min**

Sîbera min êvarî mir
Erê yarê dem êvare û
Sîbera min
Rêvingekê posîdeye !!
Li ber tev dergehên bajêrî
Di gerhîtin...

Dilengîtin
Belê çi dergeh vene bûn
Lewma ew jî
Êvarî mir
Êvarî mir.

**Seyrana Bamernê**

Çûyn Bamerrnê li şînwara
Da bi keyn seyranê li gel yara
Li mêrg û çîmen û nizara
Zêde li Mezarê xem revîn

Çûyne Gerrê ya bilind e
Pir şalîl û teyr û kund e
Manê canî vêca hinde
Beheşta ser rûyê zemîn

Reng û awazên biharê
Ba di hejînît belgên darê
Jiyan ewe yal gel yarê
Ma çawa der nabît evîn ??

Îndilbê*çenda rengîne
Navê xema qed lê nîne
Bes me axînk û hûvîne
Ma boçî ma em her bi lezîn ??

Êvare roj çû avayê

Çiyadirk  rewşa dunyayê
Lewa lê dil têne rayê
Lê baqofka sema û lerzîn.

*08/02/1977*

** Îndilb, an Kanya Îndilbê dikefte di nav bera Bamernê û firokxana bamernê.*

**Serma ye**

Jiyara min...
Wek Bihareka bê xemil
Êvareka westiya ye
Têkhelçûna hizr û xema
Vebiryana awata ye
Herftina tev xewna ye
Nijnîna asteng û pêjana ye
Avis bûna pîrhevok û dehba ye
Şeve, şeveka sar û reş !!
Rijyana stêrên merga ye
Hawar di kem
Deng birra ye
Dest bê hêz û
Leş bi taye
Teme roje û ne çiraye
Ne girnijîn...
Ne pêjna dost û yara ye
Nê serma ye
Ev şeve heyv çarde şeve
Nîsana dilê min
Payîz lê keftiye
Ev şev bara qulinga ye
Ev şeve tim bêdengî ye
Stêr di biriqin...
Heyvê coxîn nê girtiye...
Leşê bi taye
Nê sermaye.

*Nîsana 2006*

**Cejn û ser sal**

Cejn û ser sal bêy te disarin, nê wan nînin qed çi tam

Rojeka sar tu ji min dûr bûy, her wê rojê wez nemam

Ka pisyar ke ji şînwara, wan solînên li ber çemî
Hêşta reşpoş û dinalin, bi tazîne ew hemî

Deşta Hewlêrê li biharê çi xweş gerdiş cennete
Bi gorî bim naza yarê bêy wê gerdon meynete

Ew rêka axa lê borî , bo min H'ecc û Ke'baye
Ger ew roj noke bêt ve, dê bim çarde we'deye

Nêrgza şehla û mest bû, ew çav kala deng nerim
şurê serê min di dest bû, ew periya dil gerim

ji nav mij û moran û xewna, carekê ser helbirre
Ahekê bo min virêke, hêj dilê min yêb gurre

Hêj dilê jar bê semyane, bê kilîl û mifteye
Çend hizar sal jî bi borin, çak bizane bo teye.

*2009*

**Her şaîrek**

Her şaîrek surrek heye
Her şahekî durrek heye
Her bulbulek gulek heye
Her Memekî Zînek heye
Her ya mine ya bê mîsal

Biha tir bûy ji altonî
Qedir tir bûy ji Hemayonî
Tu merdtir bûy ji Cey'honî
Zanatir bûy ji Eflatonî
Ey periya çav reş xezal

Tu periya sîfet gulî
Dest bi xena û çav bi kilî
Neke tu bê dilya dilî

Carekê were vî milî
Qamet elîf lêvên helal

Dilber ji min dûr nekeve
Bêy te cîhan her dem şeve
Herdem ceng û şilq û reve
Rewşa me bêy te her eve
Wey nazika gerden zelal

Bihar nema ya hat çirî
Ey nazika tilya tirî
Wey te gerdena pirr girî
Rîsê me zivrî bû hirî
Çawa ku jêk ve dibin heval?

Nizanim bo çî an çima ?
Tu ve di key dergehê xema
Tenha êk car bêje hema
Sebr û hedara mi nema
Bûm heyranê bejna şepal

Tu heyv û stêr û gumbetî
An pirtekî ji rojê ketî
An canemerg a li ber şetî
Lê ji mirwetê tu let letî
Durrek derket ji taxê silal

Şev û roja min her tu yî
Xende li ser lêva meyî
Dêm kulîlka şepirze yî
An nêrgiza Ber Gareyî
Xudan çek û şîr û metal

Xudan naz û zirav dengî
Lewa kuşt im bi evî rengî
Bi navê xwe tu pirşengî
Li nav durra tu wa bi sengî
Wek gula li ser bi nihîtin jal

Tu yî jal û xunava min
Tu yî dem kat û gava min
Tu y deqdelav li ser ava min
Tu yî nêçîr û rava min
Li ser dilî bayê şemal

Tu tam heliz û (şîr givî)
An soryaza di serda kevî
An şaneka spî hingivî
Li ser textê dilî na liv livî
Ji canya te mam e gêj û lal

Bê y te mi na hêtin hedar
Her çar werzên min bûn bihar
Kanî peqîn av hate xar
Pê girnijîn deşt û zinar
Mêrg û çîmen bûn sed keval.

*2008*

*şîr giv = giyayeke li çelên bilind şîn di bît nêrka wî têt xwarin.*
*deqdelav= giyayeke li nav com û ava şîn di bît*

**Fikr û xeyal**

Fikr û xeyal im çû bû dûr
Hizr û bîreka bêsinor
Her çend lê gerham kûr û hûr
Bersiv ku nîne sed hewar

Bersiv ku nîne vê dinê
Boçî ji hemya wez mam bi tinê
Ku di gerhim li kuka kinê
Li deşt û çiya û kêrî û zinar

Ez ne bi tinê di grhim li wê

Pêş min hizar çûn bi vê xewê
Tiştek nezanî qed ji wê
Her çend bi kem goft û hîwar

Her çend bi kem pirs û mirsa
Di kevin goman û çend tirsa
Şemal qed lê ne helgîrsa
Ne ma li wan sebr û hedar

Bi keyn basê vê keynonê
Nihêniya vê hebûnê
Ku semaker gelek çûnê
Pê kir kenî dunya xedar

Pê kir kenî û got hûn hemî
Ka çend xîz heye li ber çemî
Hemî bin nevyên Ademî
Ev surre qed nabît diyar

Wez pisyara bê bersivim
Di mejyê hemada di liv livim
Her hişyar û qed na nivim
Çû zivistan ya hat bihar .

*helgîrsa = hel bû, agir pê geft*

**Hero spêdê**

Hero spêdê
Bê nivistin
Wez ji xew radibim
Bê nivistin xewna dibînim
Xewna xwe ji falçî re di bêjim
Tiblên min yên bûyne stirî
Davên serê min ejdehar
Didan ên min bûyne gûzan
Û çav bûne kûrha agirî
Falçî revî
Ji ewê salê
Heta noke
Yê di kete xar
Yê di ket hewar .

**Çavên min**

Çavên min wek
Rûbarê zê û xabûr in
Birînên min
Wek gelyê Balind a û Mizûrka di kûrin
Awatên min
Wek stêrên li pişt

Heft asmana
Wesa di dûrin
B' êk bişkurîna lêvên te
Xem koçber dibin
Kovan dimirin
Awat bi cih tên
Bekrok dizirrn
Bekrok dizirrn.

**Ka**

Ka ew dar berûya me hêzk pêve kirî
Ka ew kezan a darben a
Hero me benîşt jê kirî ?
Ka ew sûlava pirçê xo
Herro sê car
Li ber terr kirî ?
Ka ew hevrist a bi hevristûnk
Ya me agir pê helkirî ?
Ka ew kuropê me mazî
Têr jê kirîn ?
Ka nê bîst û çar kanyên te ?
Ka sê sûlav ?
Ka sê rûbar ?
Ka ew aşê bi av û cobar ?
Ka nê birinc, kuncî û maş ?
Ka nê garis ?
Ka nê tehle ?
Hemî neman
Sîs bû bihar .

*2005*

*dar ben =dara benîştî = dara kezan ê .*
*hevristûnk = tîvil ê qurmê hevristê di hête bi kar înan bo helkirina agirî .*
*kurope  = terhên dara mazî yên êk salî gelek mazî pêve di hên .*

**Hozan çi ye?**

Zarokekî pisyar ji mi kir
Hozan çi ye?
Ji kîrê dihêtin
Kîve di çît?
Kevne nave
An ya nû ye?
Ho lawê min
Hozan verêja pîroz e
Ronahî ye hem tarî ye
Hozan beheşta bê toz e
Mahîneka bê lixav e
Lewma xudan qonquloz e.

*1993*

*Lewma   = boye, ji ber hindê.*
*qonquloze = ser û bin, anko ser li erdî û pê li jor.*

**Hevde sale**

Hevde sale

Helbça min
Birînên te hêşta di nû ne
Hevde sale
Dil pirr kul û çav bi girîne
Hevde sale
Roj şerm di ket
Bête derê û zarokên te
Heta evro
Boyax çîne
Hevde sale dil di qir qiçît
Xanî û kolan
Heta noke
D i heriftîne
Hevde sale
Bi xêra te di xon
Pîr û canên te di pirsî ne
Hevde sale
Li nav bera kesk û zerî
Hlebçeyî ji bîr kirî ne
Hevde sale
Goran bi xeme û
Hem gaziyên
Mewlewîne
Hevde sale
Nifrîn li celladên te di barin
Ku her Seddam bi tenê nî ne
Yê çê kirî û
Yê helgirtî û
Yê bi kar înay
Û yê mit may
Hemî têkda
Di har û dîn û
Bê mejîne .

*16-03-2005*

**Te digot**

Te digot bêy te
Çi bihara na çerînim
Pirrî çavên min bûye to
Êdî neşêm
Çi kesên dê bihewînim
Hetavsorka vê êvarê

Pê ageh e û
Wez bo teme
Heta kezya spî vehînim
Te di got bes rojeka li gel te
Ger bi bînim
An bi çerînim
Vêca bimrim
Min ew bese
Ewê rojê
Her dê bînim
Te di got piştî evîna te
Neşêm bijîm
Qed rojekê
An bi mînim
Te di got, Te di got
Min deng nekir
Di kûratiya çavên te de
Barek ji xema
Wek livayê
Min her şekir
Min bawer kir
Hindek cara
Bawer nekir
Lê her çi bît
Li dilê tarî
Te pencerek
Ji ronahiyê têde vekir .

*14-10-2010*

**Ma çi bêjim**

Ma çi bêjim evê jînê, mirwet û însaf dikêm
Neşêm medha bi kem bo para, bibime derwêş wez neşêm

Hindek çawa ba bihêtin, bêdera xwe de neba
Şerim naken ji dîrokê, çi kesê hat merheba

Hizr û bîra mi Kurdistan, azadî jîna mine
Ger mirovê serferaz bît, mal û milk ma bo çine ?

Ger neşêm şî'ra xwe çap kem, dergeh evro pirr hene
Li vêrê wêrê dê belav kem, bo min û hem bo tene

Rêbaza min serxwebûne, êketya Kurda hema
Ger mafê xo tu ne xazî, kes na bêjît ha hema

Kes na bêjît eve bo te , maf bi xurtî tên standinê
Çawa dexlê te dê hêtin , tov ne hat bît çandinê

Tov nê êke pirê çêke, da derbaz bîn em ji çema
Bi bin êk dest nemînin mest, da bi revînin tev xema .

*2008*

**Dem êvar e**

Dem êvare û payîza li me xinzirî
Rev û roye bab nema li hûvya kurrî

Meh tebaxe û pîş û pelex kuzirî
Tevnê ristî careka dî bû hirî
Ketîn xefka bo me danay gawrî

Ev çi wexte , ev çi sale çi zeman ?
Li vê cîhanê qed neman bext û eman
Çi gal gale kul û xem her bo me man
Leşker zore her wekî xîzê çeman
Sotin gund dar û rez mêwa tirî

Leşkerê dujmin gurêxe y ser birre
Bê hiş û bîr her wekî se yê dirre
Van firoka wekî stênga mirrmirre
Reşand kîmya û bomb û topa gurrgurre
Babê wîjdanê ji mêje yê mirî

Were sehke vê cîhanê ey bira
Tev bê dengin mîhin di pîstê gura
Kanê aştî, ka tenahî, ka çira ?
Bese bese, bes biken medh û tirra
Çav niqandin dev dê bêy yê vedurî

Zulm û zorî her me dî ji destê neyar
Xûn herikî bax û rez mane beyar
Bê hewar û bê egîd û bê siyar
Kanê rastî, ka yeksanî, ka jiyar ?
Vê êvarê çirayê me vemirî

Kanê koma milleta evro di xewin ?
Maf û wîjdan baş bizanin direwin
An em Kurdîn lewma bo me na çewin ?
Dê rojek hêt birînên me dê kewin
Şuna kevra balgehên me bin hirî

Vê tawanê hemî di bînin aşkera
Lê kes na bêt ev ne başe ey bira
Ji gund û mala wem ketîn bin çadira
Sirr û serma yê me di gezin wek gura
Li hûvya ga bi zêt qed jê naxoyn em firî

Ger bibin êk pêgve rabin ey heval
Dujmin dê şkêt çend hebin tîr û metal
Bihara me dê xemlîtin sor û al
Dê ava bît bo me dewlet û perrgal
Dê riswa bît dujminê xudan kurî .

*Kampa Mêrdîn ê-1989*

*bîrhatina Enfala 1988*

**Qirr ket kolkê mirîşka**

Evro spêdê ji xew rabûm
Çi hewar û hengame
Wez li ser cihî du tabûm
Mirîşka kir bê qame

Qirr ket kolkê mirîşka
Wey te berçêlk dirrhayê
Rabûnê bi şal û daska
Wey qirrê çav peqyayê

Zerê girt û vekêşa
Reşê got dora mine
Qirrê heware ji êşa
Kes nahêt tana mine

Paşî her çar bezînê
Dê bêy axir zemane
Pêgve wek sey rewînê
Qirrê tu çeka dane

Qirra di bêjît wez qirr bûm
Elhoya ji ber min di dana
Ser mezin nîkil birr bûm
Çi ketme rîpa vana

Xo ne eve mirîşkin
Dê bêy seyên gurêxin
Nîkil jehr û dûpişkin
Yê wan bi vêt dê êxin

Ya di bêt reşê ezbenî

Mi gotî em hev rengîn
Pêgve bi xoyn, bi keyn kenî
Welew em ne êk dengîn

Reşê got wêve ji kîve
Tu qirra dev mirarî
Nîkilê te herê bi gû ve
Bes pirr bi ke xirarî

Nêzîk bûm da seh kemê
Mi got babo ev çiye ?
Kanê çiftê da bi bemê
Mi got belkî rûviye

Mi dît qirrek xwelî ser
Ya vedlerzît li qurnetî
Çar Mêka hêriş kir ser
Ji ceng û şera ya ketî

Çawa dergeh min vekir
Mirîşka xwe vekêşa
Derfet hat qirrê kir pirr
Çû nav qirş û gilêşa  .

*2008 Ussel*

*1- Xirar = cihalê mezin  2-rîp = bela  . 3-Gurêx = har  . 4-mêk = corekê firokên şerker .*

**Çi roj baş e**

Çi roj başe ji devî derket
Dil û cerga li min kerket
Wekî badarê min zerket
Bi dava kirme zîndanê

Bi davên bisk û çavên te
Bi xenda li ser du lêvên te
Bi du hirmî û du sêvên te
Pêgve hatme girêdanê

Te dêm heyva neçît ava
Gerden xêla wek sûlava
Bi zulfa te ketim dava

Neşêm qed bême meydanê

Neşêm qed bême bazarî
Ji nûve ketme bin barî
Ku rehma te li me ne di barî
Çi lê bi kem êdî jiyanê ?

Jiyana min hemî reş bû
Çend wez bi sojim ew her geş bû
Ku bextê me pirrî heş bû
Hawar ji destên xan û manê

Hawar ji destên babelîskê
Dest sor kirin bi xena tîtkê
Dila vêca were qît kê
Vê nêrgizê û vê şîlanê .

**Wez Şerzadê Berwarî**

Wez şerzadê berwarî
Xelkî li cih di nasim
Hindek wek koremarî
Hêj nizanin çi qasim

Hind di xişîm û nezanin
Bi devî xo di kene bira
Di lewçe û dar giranin
Li xo di birrn rêk û pira

Rastî darê xudê ye
Mirov pê di bît serferaz
Mellaqî ne çi rê ye
Xudan herdem belengaz

Hindek hene bi mirwet
Zelam û çak û camêr
Hindek jinin bi rast hurmet
Li dîrokê bûne navdêr

Hindek hene her nebin
Çêtire hizar cara
Difn û guh jî jê ve bin
Bila bi çin nav dewara

Hindek merhem û şemal
Hînkatya sihariya
Hindek hene çav xezal

Her ewin rewşa çiya

Hindek sivik belafiş
Di vêt jê bi revîtin mirov
Hinda nînin eql û hiş
Bila bi birhîtin ew tov

Hind agirê bin kayê
Ji serve dê bêy çi di baş in
Dê jê bînî belayê
Zebanyêt bê me'aşin

Bi giştî berê li filosa
Kurdistan a ji bîr kirî
Bi zivrin li 'erd û namosa
Bo halê xwe bi ken girî

Ka kî heye li vê dinê
Çil milyon û bê dewlet
Bo çî ho mayne bi tinê
Aşê me di zivrît xelet

Çunko em xo perêsîn
Her kesê berê li xoye
Hirya xo baş na rêsîn
Lewma milletê çûye .

**Her sal**

Her sal meha gulanê
Berê me di kefte gundî
Dibistan neman panê
Hey hê gunda çend rindî

Bih xîv bûn sêv û hirmîk
Bêhna nefel beybîna
Di xûn germin pîr û biçûk
Jê têt bêhna esmîna

Di hat wextê herî kêla
Zevya di ken kertik mişar
Di kevnê bi bêr û merbêla
Dep û nêrav di bûn diyar

Nîvro di xon kunce rûnê
Li gel gulola ho şirîn
Bi kefçkên darî bezînê
Çend xweş bû rûn û tehîn

Di bûn şeverok êvara
Spêdê berd di bûn aqarî
Da ripînin spîndara
Hind bêjin werin marî

Mazî çin li ser kêriya
Mexel li bin bêlimbîrê
Guh li me kerr bûn ji gaziya
Diho kanê Simo li kîrê

Zerî di bên heyranoka
Fîstan sor li serê jorî
Ba di hejînît dersoka
Dê were bihar borî .

**Bes hûn biken**

Bes hûn biken himbanê
Pîçek maye dê peqin
Pêjan ken Kurdistanê
Derazînka bûy teqin

Noke gelek ji berprisa
Gendel û fayl çîne
Hindek mirin ji birsa
Li jêr lêdana qamçî ne

Hêj gelê me li Kerkukê
Li jêr xîvet û çadira
Salê naçin serşokê
Ev mirwete ma bira ?

Hindek caş û mosteşar
Yê bi para bûy ne xenê
Kirrîn hemî gund û şar
Di vêt alîkê bi denê

Hindek pêşmergên kevin
Jar û melûl li ber dera
Di vêt ji Kurdistanê bi revin
Ji ber cotkên nêre kera

Hindek qelem firoşin
Qed na nêrin dîrokê
Li cem axa zor di beşoşin
Bila bi qutnê tîrokê

Wan şoleb xelkî nîne
Mirada wan pare ne
Tev di pîs û til genîne
Ji mirwetê di bê çare ne

Hindek mela û miftî
Gelek ne ji wan çak tirin
Di xon bi şirînî suhtî
Dara başyê yê di birrin

Mela ji nû bone derwêş
Axa y çi got got weye
Li ser sifr a wî bûne mêş
Seyda çi xoş paleye

Hindek zana û qutabî
Berê wan ket filosa
Her eveye sebabî
Ew jî ji dest me çûn hosa

Lewma halê me eve
Heta noke jêr destîn
Evê bigre û vî bi deve
Ku em her xwe perstîn .

**Kaxeza te**

Kaxeza te gehişte min
Lê çi lê bikem ?
Nahêt xandin
Wek tehlîşkê
Ya perr perr e
Kaxeza te niviştok e
Metelok e
Celcelote an mêzere
An gulolkeka bê sere
Li ser lêvên birînên min
Bes bi çere !!
Dil nê êke û
Na bîte du
Min bi hêle û ji min bi gere
Evîna te
Ger hosa bît
Darek xirşe û
Ya bê bere
Ya bê xeml û
bê sîbere
Girrnijînek
An m, tu di vêy

Ji xwe ne qere ?
Evîndarî
Ne xobayî bûne ne jî
Tirs û şere
Babelîskeka çiyane
Lewma herdem
Tol û tere
Dîsa were
Da bizanim
Heta noke kanê çima
Li mi girtiye
Te ev dere ?
Ka bîne xala gerdenê
An ji dilê min
Barke û herre
Barke û herre .

**Diz û gendel**

Mizewer diz û gendel
Evroke yen bûyn paşa
Gelek mes'ol û serpel
Nezanin bûn temaşa

Her kesê hat ewê li gel
Ji ber alîk û m'aşa

Ev kese çend nezane
Heyî neyî nê ez im
Ser tejî qirş û kane
Li hemî rêka dê bezim
Ma mirweta hosane
Yê min bi vêt dê gezim

Her tiştê bûye waste
Pa kanê maf û rastî ?
Her hejarê bê pişte
Hêj têr naxotin mastî
Her ê di piştê ra xişte
Gava ku wî maf xastî

Hindek pêşmergên berê
Jar û melûl li ber dera
Wan na ben ser bêderê
Welew ewin yên ji fera
Ketin çerxa cencerê
Dê bixon hişke bera *

Wek wez temaşa di kemê
Hindek refîq serwerin
Cih û alîka bi demê
Bi fîke fîk dê çerin
Ew bekrokin bo mem ê
Tijî dîwanê kerin

Ewê henê ew nebû?
Kat û wextê Seddam î
Zeytonî yê pê ve bû
Fexir di kir bi hindamî
Ma tu di bê y ew lêve bû
Di înye rêza pismamî?

Nê her ewin yên berê
Tenha ji ber pareye
Paqij ne bûne ji gerê
Gotina bê faydeye
Bi şev û roja li ser çerê
Ka çi bêjim nê weye

Hind ho zû bûn milyonêr

Ev pare ji kîve hate?
Wan li ezmanî bêt qunêr
Nê şelê wan bû pate
Kengî hosa bûn dilêr?
Ka kê ev hemî da te?

Rojekê dê li ser vekên
Dê li we bîte jehre mar
Rojên reş bi ser we de tên
Bo we na mînît bihar
Kanî û comên me dê zên
Dê serşor mînin neyar

Hindî kirî hejarî
Hemî ya çûy bi avêda
Çend wî dît tehl û tarî
Hêj yê di binê gomê da
Tiştek nahêt ser zarî
Bi şev û roja di xemê da

Bi şev û roja y melûle
Welew wî kirye xebat
Şol dîtin jî bi bertîle
Şol ê pûç û turuhat
Her me xudê delîle
Ha roja me nê helat .

*2009*

** ez bi xwe êk ji wan pêşmergên kevnim*
*Zeytonî = cilkên berpirsên rijêma seddamî bûn*

**Pêlek**

Pêlek ji derya çavên te, bi ser singê mi da borî
Wesa geş bûm li vê êvarê , wek şenge nêrgza jorî

Çira helkir bo min meşxel, ku bêy wê qed çi nabînim
Vê payîzê bihar di hêtin , wê bi destên xwe ku roj îna
Bi ne çarî evê carê , li dîwana wê dê rûnim
Ger bêjin ma çi canye lê , nê can tir bû ji Stî û Zîna

Erê yarê wezê hatim , dê zivrim ve wekî cara
Serê spî bûy çavên tarî , qeda li bekrok û neyara

Wekî dibînim şemal hel bû , ji asmana gulav barî
Nihal û mêrg û com û av , hizar renga ku xemlîne
Ji xew rabe bi nazdarî , hilo nê çûn şevên tarî
Were carek li hedara min , te sing zozan feraşîne

Dê zivrim ve bo wan roja , Ewan dema ewan gava
Evê carê ger te bi bînim , pîrê kal ji nû dê bît zava

Te got bo min li xerîbî yê , ku rojek dê te bîr hêtin
Girî û zêmar û ahên te , ji xewa şîrîn dê min raken
Dê nêrgiz çirmisin pêgve , ku çav dê hêstira rêtin
Çend veşêrim evîna xwe , nê rondik her dê xoya ken

Dê zivrim ve bo şûnwara, Şîvgerm a me ji nû dê zêtin
Şilêr û tevrî dê bêjin, rêvingekê ji dûr di hêtin

Mizgîn dê gehte zozana, Çiyadirk û Metînê min
Dê bên kurrê me zivrrî ve, xerîbîn em ji hozana
Ji vê hizrê birîndarim, agir berbûye cergê min
Rondik barîn ji çavên min, her wekî nerme barana

Rêvingê şeva tarî bûm, ket bûm nav pêl û dûmana
Ger zivrrîm ve evê carê, derî veke li mêhvana

Ger dunya têk biçît pêgve, erd û asman ser û bin bin
Evîna me her dê mînît, ji dîdarê hûvîdarim
Bekroka dê let û pet kem, ger bînahya çavên min bin
Bi tîra ebrûyan panê, nê evroke birîndarim .

*2010*

*Ev helbeste li ser awayê STANCE a frensî hatiye çêkirin ku li sala 1580 li ser dewrê Henri III bo cara êkê kete di nav helbesta firensî de .*

**Dilê min borî êvare**

Dilê min borî êvare
Serê min gêj pê potîne
Ev êvare gelek sare
Çavên damay dil xemgîne
Rojê perê xo dahêla
Hetavsorka were bibîne
Çi canyeka qeşenga lê
Spêde hemî te gorîne
Te çend har berdan beyara
Pezê xwe ka tu bicemîne
Ji rêka min vede dehla
Ev çi pêjan û strîne
Ji dîdarê min ne dûrke
Ku çavên min di birsîne
Li te çi geşe bihare
Li min sotin dil û sîne
Ji çavan te durr dibarin
Te lêv şekr û hingivîne
Bi êk nêrîna çavên te
Dil û ceger velerzîne
Çi lê bikem mulkê dunyayê
Bo çine çîn û maçîne
Kalik dirya li rêka te
Nê min pehnî keliştîne

Her bihostek bi sed sala
Ku min pêngav têk bestîne
Were zalim pênceh û şeş
Bihar ji jîyê min borîne
Çi stêreka geşî li asman
(Ji gurohê mah û perwîne )
Bes agirî berde dilî
Kezî û biska bes bihejîne
Ma kengî hoye dildarî
Ma ev cenge an evîne ?
Dilê min te ji min barkir
Her carekê tu bizivrîne
Barê xema ka tu bihêle
Wî rûbarî ka bişeqîne
Te lêv al wek helhelokê
Te sîng û ber soryazîne
Çi geş bihare dêmê te
Ew çi çerwan û şevîne
Ew çi gulên bistîk zirav
Ew çi sêv û çi hirmîne ?
Ew çi hêve li ser hêvekê
Ew çi bêla şaneşîne
Ew çi fêqyê ho gehiştî
Ew çi tuhûrk û tûne
Ew çi kemere li navtengê
Ew çi şale çi rûşîne
Ew çi çavên dil hengêvin
Ew çi tîrên agirî ne
Ew çi baqofkên ne vebûy
Ev çi dilên azirîne
Ew çi dile hosa yê kel
Ew çi dojeh çi êtûne
Ew çi bêhne hoya nerim
Lûlaperên berçelîne
Ev evîna ho ya mukum
Dê bêy kevrên xweristîne
Ew çi heyva xerman girtî
Ew çi zendin ew çi rûne
Ew çi pirçê ho ta belav
Lêv hinarkên radoşîne
Ew çi xale li rûyê te
Ew çi berdilk û morîne
Ew çi mêxek li difna te ?
Ew çi sosin çi solîne
Ew çi tiblên xenakirî
Ew çi belgên dîndarîne
Ew çi pêjane li dor çava
Ew çi stiryên kinarîne

Ew çi devê wekî sedef
Ew çi dindkên hinarîne ?
Ew çi qede ew çi bala
Çi gerdena reng zêrîne
Ew çi qutke ew çi kiras
Ew çi nitrek gulalîne
Ew çi tîte li enya te
Lewendî jî armûşîne
Ew çi tîrin ji çava dibarin
Ev çi dilên herişîne
Ew çi nerme rêve çûne
Ew çi naz û dalehîne
Ew çi bendin çi heyranok
Ew çi zêmar û narîne
Ew çi pit pit çi gazinde
Ew çi daxaz û nifrîne
Ez çi bêjim hêşta kême
Gotin hemî diqerisîne
Wek naza te qed nabînim
Ne çi Sitî û ne çi Zîne
Ne Sineyî û ne Sablaxî
Ne Mêrdînî û ne Çelîne
Were avde van gulzara
Panê baqofk çirmisîne
Ger tu li gel min bî delal
Yek pakî min bi dinê nîne
Her evîne ya may zelal
Serokanî tev şêlîne
Bihara min tu yî herdem
Wekî rojê ser helîne
Te peymanek dabû dîlber
Kanê sozê tu bi cîh bîne
Ev dile her dem ê bi azar
Çenk û per jî di sotîne
Bila rehmek li me bi barîtin
Ku lêvên min di têhnîne
Were ber sîbera kevra
Kurdistan warekê hîne
Yê nezanît bêhna biha
Bawer bi ke y har û dîne
Bihara ter bi mij û moran
Zivistana me befrîne
Dilê jar nê herê li taqe
Were carek li vir rûne
Wesa sivik li ber dilî
Ma êk wek te ya şirîne
Derî ke suhbeta çava
Dilê xwe qed ne xapîne

Ku bersfk dûkêlê girtin
Car û bara helbijîne
Li neyara qed ne zivre tu
Tu di zanî ka ew kîne
Çi bekrok lewçe û çivêlin
Hemî pêgve di lewtîne
Wek hêstra mêşik hat yê
Wekî stênga di êwirîne
Çi ser hişk û hem nezanin
Dilê wan ê bi kerb û kîne
Wek dara hişk dê bêjî ku
Ev  neh deh sale di mirîne
Qey başyê  na bînin ew
Dilê kore çav peqîne
Çi dermanê vê dil reşyê
Ji rêkê ew tehsîne
Were cîhana dildara
Ka zozana tu bi çerîne
Kurdistana me rengîne
Dol û nihal feraşîne
Were zalim da te bi bînim
Cergê bêzar dilê bi xwîne
Eger hêşta ne bişkurrî
Dê min ji vêrê rateqîne
Bulbulê jar bê deng maye
Yê bê xunav û esmîne
Mi pişt çemya wek gopalî
Pirasî li min têk peşîne
Ev êxsîre gêj û lal man
Sewda ser û helhelîne !!
Li benda te qermokî bûn
Hemî pêgve dihefsirîne !!
Bê ser û ber pirçê belav
Dê bêy gurga veçirîne
Tev qehr û kovana ji dilî
Tu bide bay û bifrîne
Min nevêt rojekê bi xem bî
Dura ji çava ne barîne
Neyara tu vede ji rêkê
Ji mirwetê diqemoxtîne
Çi bê biha û bê nirxin
Wek simaqê dibişaftîne
Were avake tu dilî
Nê berkaşxank diheriftîne
Ka bibişkure wekî rojê
Ka wan xema bihelweşîne
Ka kê dilê te hêlaye?
Ku wan çav lê perçiqîne

Zerwêle ev sal ne hatin
Hudhud û kew nezivrîne
Kanê gasre ka reşwêle?
Bihar bê wan bihar nîne
Tu bikey bê dilya dilî
Tu bi xwedê ma guneh nîne?
Eger her ho binalim ez
Tu bi xwedê qey ma ev jîne?
Ger te nevêt ne bişkurre
Pîçek lêva biliv livîne
Heta spêdê li benda te
Ji hizrada me xew nîne
Li dilê min xem bûn tilove
Kul û kovan Jî piştîne
Ji ber van ax û nalêna
Ber û dar tev bihiştîne
Ger bêjî min tu ji bîrkirî
Ew gotinên bazarîne
Ka boçî ya tirş û tondî
Ev çi rik û hevrikîne ?
Yê nezanît bihayê te
Nê kanzaya jêr zemîne
Kî dibêjît dilê mirî
An me peyman ji bîrkirîne ?
Me lêv hişkbûn ji dûrya te
Ji sermada hebhebîne
Ku rêka te gul û gulzar
Ya min pir dirk û dasîne
Her wezim stêra dihejmêrim
Gundî hemî dinivistîne .

*2010*

mêxek = qerenfil
radoşî = tirş û şirîn
gasre , zerwêle, reşwêle, hudhud = balindene
kaşxank = helaşe banî ji navda, supîtk

Sed cara dil

Ji dûryate perêşanim
Ji qehrada wêrane dil
Heta kengî dê her sojim ?
Ku her agir barane dil
Bendeyê zolfa bi xunave
Heyranê wan xalane dil

Ji bilî te ma bo kê ye ew ?
Bo naza ber malane dil
Her rojeka bêy te biçît
Çendê bi qehr û kovane dil
Wek nêrgiza şehla û mest
Li çavên xumar belane dil
Ger bêjî ma çi hale yar ?
Ji nalêna talane dil
Ma bo kê ye dilê bîmar ?
Ji bo cana canane dil
Ka lez bike bi lezîne
Nê hêşta bê semyane dil
Nizim qed ew na dadetin
Bilinde li ber çelane dil
Çend bargiran û xemkeşî
Te bar mîna çîyane dil
Te sîng pirr dirr û mirarî
Çi bêder û xermane dil
Te dil bû goma evînê
Bê gerde ne spîtmane dil
Te dil zêrrê cocelandî
Ku çend merd û dodmane dil
Qey ji vî dilî tu natirsî ?
Şûrekê bê kavlane dil
Ev dile bo te li taqe
Bê dergeh û astane dil
Min dil bû pûşê zer beyî
Yê te îro zêrrkane dil
Yê min pîr bû bi cehêlînî
Li bin zulma salane dil
Dilê min xirte bê ave
Te hewdik u guldane dil
Dilê min belg tev jê weryan
Yê te hêşta zozane dil
Yê min geda û koleye dil
Yê te şahê şahane dil
Ger roj li dêmî azrî
Li sehrayê seywane dil
Kesê dî ew qed nabînît
Bi çavên te mojgane dil
Her çenda dûrjî bî bila
Her û her yê bi jivane dil
Her vekole tu vî dilî
Gilkena li ber tevrane dil
Ev dile bû derya xema
Ku herdemê bi fîxane dil
Ji awirên çavên belek
Çendê lal bê ezmane dil

Qed rojekê rohin na bît
Her yê bi mij û morane dil
Dil deryayeka bê bine
Yê bê gez û pîvane dil
Bo dilên bi agirî sotîn
Tenha ewe dermane dil
Çi şêveka nû pilxane
Xweş sote û kêlane dil
Ger çi derman te nedîtin
Bo bîmara luqmane dil
Li ser xatra çavên xumar
Ji bo tîra nîşane dil
Ji vê êkê herê xemgîn
Çendê bi êş û jane dil
Ma qey dilên rast û drust
Ma hêşta tu di bêy mane dil ?
Ka bêlayê bixemlîne
Nêzîke li te mêhvane dil
Ma bo kê dil dê bişkurrît ?
Tenha bo Kurdistane dil .

Şêrzad Zeynelabidîn
15.12.2010